**Rêziknameya Reftara Pîşeyî û Exlaqî ya Sektora Ragihandinê li Sûriyeyê**

**Pêşek:**

Piştî ku bi dehan salan azadiya derbirînê û rojnamevaniyê li Sûriyeyê tune bû, hilweşîna rejîmê di 8ê Berçileya 2024an de, derfeteke mezin peyda kir da ku jîngeheke pîşeyî ya tendirust were avakirin, nirxên azadiyan werin çespandin û sûd ji qonaxa vebûnê were wergirtin. Her wiha, ev guhertin derfetê dide ku em gavên xwe li gorî geşedana bilez a amûrên ragihandinê bavêjin û rûbirûyî belavbûna gotarên nefretê û xapandina li ser torên civakî bibin.

Ji bo avakirina jîngeheke ragihandinê ya tendurist ku hevsengiyê di navbera azadî û berpirsiyariyê de çêbike, hevkariya hemû aliyên pêwendîdar dibe pêdiviyek da ku pîşe di hemû astan de were birêkxistin kirin.

Ev rêzikname wekî çarçoveyeke bingehîn kar dike ku rê nîşanî xebatkarên ragihandinê dide, maf û erkên wan diyar dike, alîkariya wan dike ku karên xwe bi awayekî serkeftî encam bidin û di heman demê de dibe pîvanek ji bo nirxandina xebatên wan.

Ev rêzikname, berpirsiyariya civakî ya xebatkarên qada rojnamevaniyê nîşan dide û pabendiyên wan ên li ser bingeha nirxên exlaqî, yasayî û rêzikan zelal dike. Her wiha, erkên wan ên li hemberî civakê û hemû aliyên ku bandorê ji karê ragihandinê digirin diyar dike; bi vî awayî binpêkirin kêm dibin û rê li ber bikaranîna xirab a "desthilata rojnamevaniyê" li dijî kes û civakê tê girtin.

Rêzikname komeke pîvan û nirxan lixwe digire ku ragihandinkar, sazî û xebatkarên vê sektorê di dema komkirin, dariştin, weşandin, şîrovekirin û analîzkirina agahiyan de pabendî wan dibin. Ev pîvan dibin bingeh da

ku mirov karê xwe binirxîne û gava binpêkirinek çêbibe, li gorî lihevkirinê gav werin avêtin.

Saziyên ragihandinê, rêxistinên civaka sivîl ên di qada medyayê de dixebitin, rojnamevan, ragihandinkar, berhemhênerên naverokê, bandorker, welatî-rojnamevan û her alî yan kesê ku xalên vê rêziknameyê qebûl dike û îmze dike, dikevin bin sîwana vê belgeyê.

**Destpêk:**

Ev rêzikname, ji pêdiviya misogerkirina azadiya raman û derbirînê, mafê cemawer ê agahdarbûn û gihîştina zanyariyan, û mafê ragihandinkaran ê pêkanîna karê wan (li gorî pabendiyên mirovî, exlaqî, pîşeyî û civakî) dest pê dike.

Ev rêzikname bingeha xwe ji prensîbên azadiya ragihandinê yên ku di Madeya 13an (Benda Yekem) a Daxuyaniya Destûrî ya Komara Erebî ya Sûriyeyê de (ya ku di 13ê Adara 2025an[1] de hatiye weşandin) digire. Di heman demê de, bi Madeya 19an a Daxuyaniya Cîhanî ya Mafên Mirovan û her du madeyên 19 û 20an ên Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî re lihevhatî ne.

Ji ber giringiya rola ragihandin û rojnamevaniyê di gihandina rastiyan ji raya giştî re, bi awayekî pîşeyî û babetyane; bêyî cudakarî, alîgirî, zêdekirin an bikaranîna ji bo armancên siyasî û ji ber rola wan a di piştgirîkirina geşepêdanê, temsîlkirina cemawer di çavdêrî û lêpirsînê de

[1] Naveroka benda yekem a madeya 13an ji Daxuyaniya Destûrî ya Komara Erebî ya Sûriyeyê (ya ku di 13ê Adara 2025an de hatiye derxistin) wiha ye: "Dewlet azadiya raman, derbirîn, medya, weşan û çapemeniyê mîsoger dike."

û bihêzkirina aştiya civakî; gotûbêjên berfireh hatin kirin. Armanca van gotûbêjan, pejirandina rêzikên pêkanîna pîşeyî di sektora ragihandinê de bû, ku alîkarî da avakirina jîngeheke ragihandinê ya pêşketî, şefaf û berpirsiyar.

Bi sedan rojnamevan, welatî-rojnamevan, saziyên medyayê û çêkerên naverokê yên li ser torên civakî (wekî nûnerên ragihandina serbixwe, fermî û taybet) û bi beşdariya cemawer ji çînên cuda yên civakê, beşdarî van gotûbêjan bûn.

Kesên beşdar li ser pejirandina kopiyeke berfireh a bi navê "Rêziknameya Tevgera Pîşeyî û Exlaqî ya Sektora Ragihandinê li Sûriyeyê" li hev kirin. Li gel vê kopiyê, kopiyek kurtkirî ku giranî dide ser prensîpên bingehîn bi navê "Belgeya Rûmetê" û paşkokeke taybet ji bo çêkerên naverokê hatin amadekirin.

**Pênase:**[2]

**Rojnamevan:**

Ew kes e ku bi awayekî birêkûpêk kar li ser komkirin, piştrastkirin, dariştin, analîzkirin an dubare amadekirina nûçe, agahî û nêrînan dike, da ku wan biweşîne yan veguherîne materyalên ragihandinê (nivîskî, Bihîstyarî, dîtbarî yan dîjîtal). Rojnamevan naverokeke resen pêşkêş dike; pabendî pîvanên pîşeyî, exlaqî, yasayî û peymanên mafên mirovan e û di heman demê de serxwebûn û berpirsiyariya xwe ya li hemberî cemawer û berjewendiya giştî diparêze.

[2] Ev pênase, pênaseyên wezîfî ne; armanc jê diyarkirina çarçoveya pabendbûnê ye, ne nirxandina kesan e.

**Ragihandinkar:**

Her kesê ku kar di saziyeke ragihandinê yan platformeke weşanê de dike û beşek ji dahata xwe jê peyda dike, di berhemanîn, derhênan an weşandina naveroka ragihandinê de (çi bi rêya wênekêşî, pêşkêşkarî yan rêveberiyê be) xwedî rol e û pabendî rêzik û referansên saziya xwe ye.

**Çalakvanê Ragihandinê:**

Her kesê ku xwedî ezmûneke ragihandinê ye û amûrên medyayê yên klasîk an torên civakî bikar tîne da ku bûyeran belge bike, agahiyan bigihîne yan nêrîna xwe bîne ziman; bi armanca agahdarkirina cemawer, bandorkirina li ser raya giştî, yan piştgirîkirina guherînên civakî, siyasî û aborî.

**Welatî-Rojnamevan:**

Şahid an beşdarekî xwebexş e ku zanyariya wî ya ragihandinê ya pîşeyî kêm e. Tiştên ku dibîne bêyî çarçoveyeke pîşeyî yan armanceke diyarkirî vediguhêze; bûyerekê belge dike yan agahiyekê bi amûrên hêsan parve dike, bêyî ku profesyonel be yan berhema wî birêkûpêk be.

**Bandorker:**

Kesekî ku di qadeke hizrî ya diyarkirî de pispor e û bi rêya platformên civakî, amûrên ragihandinê yan civînên giştî cemawerekî ji şopîneran ava dike. Ew xwedî şiyana bandorkirina mayînde li ser biryar, nêrîn, meyl û reftarên cemawerê xwe ye; naverokekê pêşkêş dike ku armanca wê bandorkirina li ser têgihiştin, hişmendî û ramanê ye.

**Çêkerê Naverokê:**

Ew kes e ku li ser bingeha zanîn û pisporiya xwe, bi keda hişî û afirîneriyê, bi awayekî birêkûpêk naverokan berhem tîne. Naveroka wî dikare gelek qadên "civakî, aborî, siyasî, perwerdehî, medyayî, çandî, werzişî, teknîkî, hunerî, olî, jîngehî, mafnasî, geştiyarî, derûnî, geşepêdanî yan yên girêdayî ewlehiya giştî" bihewîne.

**Çêkerê Naveroka Civakî:**

Her kesê ku materyalên resen berhem tîne yan materyalên weşandî dubare amade dike; giranî dide ser jiyana xwe, serpêhatî, roj û hevdîtinên xwe yên asayî yên bi xelkê re. Platformên torên civakî bikar tîne û pişta xwe dispêre heyecanê, tevlîbûna hestyarî, dubarekirin, şahî û nêzîkbûna ji cemawer; bi piranî ber bi parastina reftar û nêrînên bikarhatî ve diçe.

**Lêkolîner:**

Kesekî di qadeke diyarkirî de pispor e û xwedî bawernameyên zanistî ye. Ew diyarde, kêşe û pirsgirêkan lêkolîn dike; vekolîn an lêkolînên akademîk û pratîkî yên ku di bin çavdêriya zanistî de ne amade dike. Ev xebat di kovar an platformên lêkolînê yên pejirandî de tên weşandin an belgekirin.

**Şirovekar:**

Her kesê ku bawername ji saziyeke akademîk di qada pisporiya xwe de wergirtiye, di babetekê de xwedî ezmûn û zanîn e, xwedî şiyana

şirovekirin û girêdana bûyer û daneyan e; nêrînên xwe dispêre bingehên zanistî, pratîkî û amûrên analîzkirina diyardeyên aloz.

**Pispor:**

Her kesê ku di qadeke diyarkirî de xwedî zanîneke kûr a teorîk û metodolojîk e, ku ev zanîn bi rêya xwendineke pisporî û pratîkeke dirêj bi dest xistiye. Ev ezmûn jêhatîbûneke wisa dide wî ku ji xebatkarekî asayî wêdetir e. Di qada karê xwe de xwedî şiyana analîzkirin, şirovekirin û girtina biryarên rast e; ev yek rê dide ku şêwirmendiyê bike û ji bo kêşeyên tevlîhev çareserî yan şiroveyan peyda bike.

**Materyalê Weşandî:**

Ew materyal e ku ji hêla rêveberiya hewalsaziyê ve tê pejirandin û di yek ji kanalên fermî yên saziyê de tê weşandin an belavkirin. Materyalên di qonaxa amadekirinê de ne, materyalên ku berî weşandinê bê destûr hatine derxistin, an jî materyalên ku ji hêla aliyên sêyem ve bi rêya êrîşên li ser sîstema saziyê hatine parvekirin, di nav vê pênaseyê de nîn in.

**Saziya Medyayî û Çapemeniyê:**

Ew saziya niştimanî ye ku li ser axa Komara Erebî ya Sûriyeyê, li gorî destûr an awarteyên saziyên peywendîdar ên dewletê kar dike. Armanca wê pêşkêşkirina agahiyan ji bo raya giştî ye, bêyî ti cudakarî yan sînordarkirinê. Saziyên medyayî yên biyanî (her çend xwediyên wan Sûrî bin jî) ne di nav vê pênaseyê de ne; ji ber ku ew li derveyî welat li gorî sîstem û mercên cuda kar dikin.

**Platform, Malper û Weşan:**

Ew amûr û rêyên weşanê ne ku di belgeya moleta saziyê de yan jî di belgeyên wekî wê de bi zelalî û bêyî ku cihê gumanê bibe, hatine diyarkirin. Sazî berpirsyariya her platformekê ku wekî çavkaniya xwe ya fermî û rewa nîşan daye, li ser milê xwe digire û ji her tiştê ku tê de tê weşandin berpirsyar e.

**Berjewendiya Giştî:**

Her berhem an weşaneke medyayê, armanca wê parastina mafên kesan û koman, xurtkirina lêpirsîn û şefafiyeta di rêveberî û aborî de, aşkerekirina gendelî û binpêkirinan, amadekirina zemîna ji bo biryardana rast a raya giştî û her wiha piştgiriya aramî û rêzgirtina li cihêrengiyê ye.

**Aştiya Navxweyî:**

Rewşeke pêkvejiyanê ye ku li ser bingeha rûmet û wekheviya mafan di navbera hemû pêkhateyên civakê de ava dibe. Di vê rewşê de tundî, cudakarî û gotara nefretê têne redkirin. Di çareserkirina nakokiyan de diyalog, yasa û saziyên fermî dibin amûrên bingehîn. Ev yek aramiyê diparêze, dilsoziya bi welat re xurt dike û nasnameyeke giştî ya hevpar (bi rêzgirtina li nasnameyên taybet) diafirîne.

**Bingeh û Çavkaniyên Rêziknameyê:**

Ev rêzikname xwe dispêre gotûbêjên pîşeyî yên di nav qada medyaya Sûriyeyê de û Daxuyaniya Destûrî ya Sûriyeyê. Her wiha, prensîb û exlaqa medyayê ya ku di peyman û daxuyaniyên navdewletî yên rêxistinên pispor de hatine diyarkirin, wekî bingeh digire. Erk û mercên pîşeyî yên ji bo sazî û kesan, li gorî van çavkaniyan têne destnîşankirin.

**Madeyên Rêziknameyê:**

**Madeya Yekem:**

Pabendbûn bi serweriya yasayê, girtina berpirsyariya civakî di gotara medyayê de, parastina yekpareyiya ax û gelê Sûriyeyê, û dûrketin ji berhemanîn an parvekirina her naverokekê ku aştiya navxweyî dixe metirsiyê, pêkvejiyana civakî lawaz dike, yan jî baweriya gel bi medyayê kêm dike.

**Madeya Duyem:**

Berpirsyariyên yasayî û exlaqî yên saziyên medyayî û çapemeniyê ev in:

- Saziyên medyayî û çapemeniyê ji hemû materyalên (dîtbarî, bihîstyarî, nivîskî) ku di platform, malper û weşanên wan de têne parvekirin, berpirsyar in.
- Di nav saziyê de, ti biryarên dîsîplînî li ser bingeha lîsteyên navan yan tometên bêbelge nayên girtin; divê prensîpa bêgunehiyê were parastin. Lê mafê saziyê heye ku li gorî nirxandina rîskên pîşeyî, hevkariyê bi rengekî demkî û bi hincet bide sekinandin.
- Berpirsyariya saziyan tenê bi yasayên niştimanî yên berkar ên li Komara Erebî ya Sûriyeyê ve sînordar e. Di rewşa hebûna

kêmasiyan di yasayan de, nîşandan an rexnekirina van kêmasiyan wekî binpêkirin yan tawan nayê hejmartin.

- Di pênasekirina termên têkildarî tawanan de, yasaya Sûriyeyê wekî bingeh tê girtin; divê ev pênase neyên tehrîfkirin yan wekî amûrek ji bo sînordarkirina azadiya çapemeniyê yan ji bo tedbîrên keyfî li dijî saziyan werin bikaranîn.
- Pabendbûna exlaqî dikare ji sînorê herî kêm ê yasayî derbas bibe, dema ku berjewendiya giştî û parastina mafan vê yekê daxwaz bike.

**Madeya Sêyem:**

**Mafên Mirovan**

**Yekem:** Pabendbûna bi pîvanên mafên mirovan di xebata rojnamevaniyê de û biderpêşkirina parastina komên herî lawaz (li gorî dabeşkirinên Neteweyên Yekgirtî), ji bo rojnamevan û xebatkarên medyayê ne tenê pabendiyeke yasayî ya tekez e, lê belê di heman demê de erkekî exlaqî û niştimanî ye.

Li ser vê bingehê, îmzeker pabend didin ku di dema her cure romalkirin û weşanên medyayî de, li gorî pîvanên navdewletî rêzê li mafên bingehîn ên mirovan bigirin.

Her wiha, îmzeker pabend dibin ku rêzê li hemû peyman û daxuyaniyên navdewletî yên ku Komara Erebî ya Sûriyeyê îmze kirine bigirin; di nav de: Daxuyaniya Cîhanî ya Mafên Mirovan û Yasaya Navdewletî, Peymana

Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî[3], Peymana Navdewletî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, û hemû peymanên din ên ku niha hatine qebûlkirin yan jî di paşerojê de werin îmzekirin.

Divê rojnamevan û xebatkarên medyayê di dema girtina dozên komên herî lawaz ên civakê de (wekî jin, zarok û kesên kêmendam), van nirx û prensîpan li ber çav bigirin. Di vê çarçoveyê de, divê rêz li hemû aliyên peymanên navdewletî were girtin, ku rêzgirtina li sînor û serweriya dewletên din jî di nav de ye.

Li ser vî bingehî, pabendbûna bi mafên mirovan, wekî beşek ji pabendbûna bi yasaya niştimanî tê dîtin. Her wiha, ev pabendiyeke bi nirx û rênmayên mirovî ye ku divê rojnamevan pê ve girêdayî bin. Ji ber

---

[3] Madeya 19an a Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî:

1. Mafê her kesî heye ku bêyî ti destêwerdanê bibe xwedî raman û nêrînên xwe.
2. Mafê her kesî yê azadiya derbirînê heye. Di nav vî mafî de, azadiya lêgerîn, wergirtin û veguhastina her cure agahî û raman bo kesên din (bêyî berçavgirtina sînoran) heye; çi bi devkî, bi nivîskî, bi çapkirin, di çarçoveyeke hunerî de yan jî bi her amûreke din be ku ew bi xwe hildibijêre.
3. Pêkanîna van mafên ku di benda (2) a vê madeyê de hatine diyarkirin, hin erk û berpirsyariyên taybet li gel xwe tîne. Ji ber vê yekê, dibe ku ev maf di bin hin sînoran de bin, bi şertê ku ev sînor di yasayê de hatibin diyarkirin û ji bo van armancan pêwîst bin:

- Rêzgirtina li maf û navûdengê kesên din.
- Parastina ewlehiya neteweyî, pergala giştî, tenduristiya giştî yan jî exlaqê giştî.

  Li beramberî vê, yasaya navdewletî weşandina her materyalekî ku handana ji bo cudakarî, nefret yan tundiyê dihewîne, qedexe dike.

  Madeya 20an a Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî:

- Yasa her cure propagandaya ji bo şer qedexe dike.
- Yasa her cure banga ji bo nefreta neteweyî, nijadî yan olî ya ku dibe sedema handana li dijî cudakarî, neyartî yan tundiyê, qedexe dike.

ku mafên mirovan, mafên giştî û cîhanî ne û ji bo her kesî hatine misogerkirin, pabendbûna rojnamevanan bi van mafan, berdewamiyeke xwezayî ya karê wan e.

Mafên mirovan rojnamevanan, azadiya derbirîn û çapemeniyê, mafê weşandinê û berhemanîna naverokê diparêze. Ji ber vê yekê, rêzgirtina rojnamevanan ji bo van mafan dibe pêdiviyek; ji ber ku mafên mirovan ew çavkanî ne ku rojnamevan mafê pêkanîna karê xwe bi azadî, bi ewle û bê tirs jê werdigirin. Ev rêzgirtin, misogerkirina mafên her mirovekî bêyî cudakarî û awartebûnê di nav xwe de dihewîne.

Erkên îmzekeran ên di warê mafên mirovan de, li gorî peymanên Erebî û navdewletî têne destnîşankirin. Ev peyman li gel hev ne nakok in; tenê rêza pêşîneyên wan li gorî çand û pêdiviyên her welatekî diguhere.

Bi berçavgirtina rewşa Sûriyeyê ya di dehsalên borî de (bi taybetî 14 salên binpêkirin û destwerdanên biyanî), rêzgirtina li mafên mirovan dibe pêdiviyeke lezgîn û çarenivîsî. Çespandina nirxên mafên mirovan di karê medyayê de, li gel rêzgirtina li peymanên navdewletî û prensîpên serwerî û serxwebûna dewletên din, yek ji karên pêşîne yên çapeminiya Sûriyeyê ye.

Medyaya Sûriyeyê pabendî mafê azadiya derbirînê û mafê gihîştina agahiyan dibe, bi şertekî ku ev yek di nav sînorên parastina mafên kesên din û parastina aştiya giştî de pêk were.

**Duyem: Pênase û Pabendî:**

**- Komên Herî Lawaz:**

Ew kom in ku metirsiya zirar, cudakarî yan kedxwarinê li ser wan zêdetir e. Ji ber vê rewşê, divê di dema romalkirinê de parastineke taybet ji bo wan were peydakirin.

Komên lawaz û bêhêz (li gorî dabeşkirina Neteweyên Yekgirtî) ev in: Zarok, jin, kal û pîr, kesên kêmendam, penaber, koçberên navxweyî, kêmneteweyên olî, neteweyî û zimanî, mirovên di hundirê welat de bêmal mane û kesên ku ji aliyê aborî ve bêpar hatine hiştin. Berpirsyariya medyayê ye ku romalkirineke hevseng ji bo van koman amade bike, ku ji alîgirî yan jî piştguhkirinê dûr be.

**Zarok:**

Di vê rêziknameyê de, her mirovê ku hîn temenê xwe yê 18-salî temam nekiriye, wekî zarok tê hejmartin. Ev pênase di her rewşê de (çi li dijî yasa û edetên din be jî) wekî bingeha sereke tê qebûlkirin. Îmzeker di derbarê zarokan de, erkên li jêr bi cih bînin:"

- Dema ku "berjewendiya herî bilind a zarok" tê destnîşankirin, divê mafê zarok ê derbirîna ramanê li gorî temen û asta gihîştina wî/wê li ber çav bê girtin.
- Divê bi kesên ku nêzîkî zarok in re (yên ku dikarin bandorên siyasî, civakî û çandî yên nûçeyê binirxînin) şêwir were kirin.
- Dûrketin ji weşandina her çîrok an wêneyekê ku dibe sedema metirsiyê li ser jiyana zarok, xwişk û birayên wî yan jî hevalên wî; heta ku nasname were guhertin an veşartin jî, divê ev xeterî li ber çav bê girtin.

- Qedexe ye ku zarok di nav naverokên ji bo zêdekirina dîtinan an qezenckirina pereyan de werin **bikaranîn**; bi taybetî dema ku ev yek zirarê dide rûmet, taybetmendî û tenduristiya wan a derûnî û laşî.
- Nîşandana zarok û nûciwanan di rewşên (girî, tirs, tundiya navmalê, hejariya giran, rewşên rûmetşikên) yan jî di çarçoveyên (tundiya zayendî, destdirêjî, leşkerkirina bi darê zorê, istixlala aborî, parsekî, dozên namûsê) de qedexe ye. Heke ji ber pêdiviyeke civakî nîşandana van rewşan neçarî be, divê hemû nîşaneyên ku nasnameya zarok aşkere dikin werin veşartin.
- Di dema bikaranîna dîmenan de, çêtir e ku nasnameya zarok bi temamî (nav û paşnav, dibistan, navnîşan yan jî her agahiyeke din a nasînê) were veşartin.
- Nabe pirsên şokdar, pirsên bi zext yan jî pirsên hander (ku bersivê li ser zarok ferz dikin) werin pirsîn, bi taybetî dema ku ev pirs trawmaya wan nû bikin. Divê diyaloga bi zarokan re li gorî temen, rewşa derûnî û şiyanên wan be.
- Dema parvekirina naverokên dîjîtal, divê were nirxandin ka mayîna vê naverokê di paşerojê de dê çi bandorê li jiyana zarok bike û dibe ku di paşerojê de bibe sedema kîjan zirarên derûnî yan civakî.
- Bikaranîna hesabên zarokan ên li torên civakî wekî çavkaniya nûçeyan qedexe ye (çi ev hesab ji her kesî re vekirî bin jî), heta ku razîbûneke agahdarane ji xwediyê zarok neyê wergirtin.
- Ew zarokên ku naverokan çê dikin û şopînerên wan zêde ne, wekî "kesayetên giştî" nayên dîtin; divê her dem wekî zarok werin hejmartin û parastineke taybet ji bo wan hebe.

- Heke îmzeker di dema karê xwe de rastî rewşeke metirsîdar, tundî yan jî bikaranîna zarokekî hatin, nabe ti hûrgiliyên wê belav bikin. Divê hewla parastina zarok bidin û rewşê bigihînin saziyên peywendîdar, her wiha vê pêvajoyê di hundirê saziya xwe de belge bikin.

**2. Kesên Xwedî Pêdiviyên Taybet (kêmendam):**

Têgeha "kesên xwedî pêdiviyên taybet" wan kesan li xwe digire ku di warê laşî, derûnî, aqilî yan jî hestî de, xwedî astengiyên demdirêj in; ev astengî dibe ku bibin asteng li pêşiya beşdariya wan a tam û çalak di jiyana civakî de. Ev pênase li gorî Daxuyaniya Cîhanî ya Mafên Mirovan û peymanên navdewletî yên peywendîdar e, ku tekez dikin ku mafê her kesî heye bêyî ti cudakarî ji hemû maf û azadiyan sûd werbigire.

Her berhemeke medyayî ku cudakariyê li dijî kesên kêmendam bike, yan jî nebe alîkar ji bo parastina mafên wan ên bingehîn û rûmeta wan a resen, li dijî nirxên exlaqî û cewherê karê rojnamevaniyê ye.

Piştgiriya kesên kêmendam bi rêya rêbazeke domdar û piralî pêk tê. Li ser vê bingehê, îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:

1. Nabe ti naverokek li ser kesên kêmendam were weşandin yan berhemanîn, heke van xalên li jêr xurt neke:

- Hişyariya derbarê şiyan û beşdariya kesên kêmendam de.
- Pejirandina mafên wan û misogerkirina rêzgirtina li wan.
- Çespandina dîtinên erênî derbarê hebûn û rola wan.
- Naskirina jêhatîbûn, behre û keda wan a di qadên kar û bazara kar de.

- Çanda rêzgirtina li cudahiyan û pejirandina kesên kêmendam wekî beşeke xwezayî ya cihêrengiya mirovî.

2. Nabe kesên kêmendam wekî sembola "dilpêşewatiyê" yan jî wekî amûrekê ji bo parandina hestên xelkê werin bikaranîn. Her wiha, divê mirov haydar be ku ev kes di romalkirina giştî de neyên piştguhkirin.

**3. Mafên Jinan:**

Li ser îmzekeran erk e ku gotarekê ku piştevaniya jinan dike bipejirînin; her wiha divê hikûmet û rêxistinên civaka sivîl han bidin ku piştgiriya avakirina civakeke bê cudakarî li dijî jinan bikin.

Her cure cudakarî, dûrxistin an sînordarkirina li ser bingeha zayendê, ku dibe sedema lawazkirin an pûçkirina naskirina mafên jinan û azadiyên wan ên bingehîn, di hemû qadan de qedexe ye. Ev yek bêyî berçavgirtina rewşa zewacê ya jinê û li ser bingeha wekheviya di navbera jin û mêr de li pêşiya yasayê tê meşandin.

Îmzeker di derbarê mafên jinan de pabendî van xalên li jêr dibin:

- Nûnertiya babetyane di nava saziyên medyayê de, çi di asta rêveberî û xebatê de.
- Dûrketin ji berhemanîna naverokên ku jinan di rolên qalibên amade de sînor dikin.
- Aşkerekirina binpêkirinên ku li dijî jinan pêk tên.

- Piştgirî ji bo beşdariya herî berfireh a jinan di jiyana siyasî û aborî de.
- Piştgiriya hewildanên ji bo gihîştina dadperwerane ya bi xizmetên tenduristiyê.
- Piştgiriya wekheviya di mafê perwerdeyê de di hemû astan de.
- Bikarnenîna zimanekî ku cih û rûmeta jinê kêm nîşan dide (wekî bikaranîna gotinên "jina lawaz" an "cihê wê yê xwezayî mal e").

Qalibên amade, yek ji amûrên herî mezin ên cudakariyê ne. Ev qalib raya giştî bi vî rengî ava dike ku kiryarên cudakar ên rojane yên li dijî jinan rewa nîşan bidin û rê li ber tundiya zayendî vekin. Bi gelemperî, ev qalib jinan tenê di çarçoveya "karên malê" yan jî "bedewiyê" de nîşan didin; lê mêran wekî rêberên jêhatî di qadên pîşeyî û siyasî de derdixin pêş.

Mebest ji “qalibên amade”, ew ramanên pêşwext û giştîkirî ne derbarê wan sifet û rolan de ku civak li ser jin û mêran ferz dike.

**. Mafên Nexweş, Birîndar Û Qurbaniyan:**

Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:

- Rêzgirtin û parastina taybetmendiya nexweş û birîndaran li malên wan û li cihên giştî.
- Dûrketin ji wênegirtina li hundirê nexweşxane û odeyên neştergeriyê; ev yek tenê di rewşên herî pêwîst de û piştî wergirtina razîbûna nexweş yan xizmên wî gengaz e.

- Nîşandana wêneyên nexweş û birîndaran bi rengekî rûmetşikên yan şokdar qedexe ye; divê rêz li rewşa wan a mirovî were girtin.
- Wênegirtina nexweşên derûnî nabe bêyî berçavgirtina hestên wan û yên malbatên wan pêk were; divê hestiyariya wan a taybet were parastin.

Mafê rûmeta mirovî, qurbaniyên sax û mirî jî li xwe digire. Ji ber vê yekê, belavkirina wêneyên miriyan bi rengekî ku hurmeta wan binpê bike, qedexe ye. Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:

- Nîşandana wêneyên qurbaniyan dema ji bin kavilan tên derxistin qedexe ye, heta ku hûrgiliyên laşê wan neyên veşartin.
- Wêneyên derxistina mirovên sax dikarin werin weşandin bi şertê ku rêz li rûmeta wan were girtin; heke di laşê wan de birînên giran yan kêmendambûn hebe, divê were veşartin.
- Nîşandana wêne yan vîdyoyên qurbaniyan di rewşên tundî û îşkenceyê de bi rengekî rûmetşikên qedexe ye. Di nûçe û bernameyan de divê tenê wêneya wan a sabit (foto) were bikaranîn. Bikaranîna van dîmenan di karên hunerî yan reklamên bernameyan de qedexe ye.
- Dûrketin ji weşandina wêne yan dîmenên ku mirovan di kêliyên xema giran (trajik) yan di dema karvedanên bêhiş de nîşan didin, da ku ziyan negihîje wan.

### 4. Hejar û Kesên di Bin Mercên Zorê Yan Lawaz de Dijîn:

Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:

- Rêzgirtin li nirxên mirovî yên hejaran, kesên di kampan de dijîn û yên ku ji ber hejariya giran, bêmalî, şer, karesat yan kêmendamiyê ji cih û warên xwe bûne. Nabe mercên wan ên dijwar wekî materyalek ji bo heyecanê, temaşekirinê, propagandaya siyasî/aborî yan jî ji bo qezencên madî û manewî were bikaranîn.
- Nabe kesên di rewşên dijwar de werin biçûkxistin yan jî êşa wan wekî malekî bazara pê were kirin. Qedexe ye ku hejariya wan wekî 'kêmasî' were nîşandan yan jî ew ji ber vê rewşa xwe ya zor û neçar werin sûcdarkirin.
- Ronîkirina dozên wan divê bi rêya şirovekirina sedem û mercên ku hîştine ku bikevin vê rewşê be; pêşkêşkirina êşa wan divê di çarçoveya rêzgirtina li rûmet, maf û dadperweriyê de be.
- Dema ku ji bo pêdiviyeke civakî yan berjewendiya giştî wênegirtina wan pêwîst be, divê razîbûneke agahdarane were wergirtin, bi şirovekirina armanc û cihê weşanê. Divê jin û zarok di rewşên rûmetşikên de neyên nîşandan; her wiha nabe zext li wan were kirin yan jî di berdêla wênegirtin û vegotina çîrokên wan de, pere û diyarî ji wan re werin pêşkêşkirin.
- Dayîna derfetê ji bo komên lawaz da ku bi dengê xwe xwe derbirînê bikin; divê ew wekî xwedî maf û aktorên civakê werin nîşandan, ne wekî mirovên ku dilê xelkê li wan bişewite.
- Her agahiyekê ku dibe van koman bixe ber metirsiyê yan tolhildanê divê bê veşartin, eger aşkerekirina wê ji bo berjewendiya giştî ne neçarî be.
- Nabe naveroka têkildarî van koman di kampanyayên siyasî, reklamî yan marketingê de were bikaranîn. Heke ji bo xurtkirina alîkariyên

navdewletî ev yek pêwîst be, divê kampanya bi şirovekirina mafên wan û çareseriyên pêşniyarkirî re were girêdan.

- Dema ku di navbera "mafê agahdarkirina raya giştî" û "mafê taybetmeniya van koman" de nakokî derkeve, îmzeker li gorî prensîpa "kêmkirina zirarê" û rêzgirtina li rûmeta mirovî tevdigerin.
- Veguhertina alîkariyên mirovî yan xêrxwaziyê bo dîmenên rûmetşikên qedexe ye. Nabe dema xwarin yan pere tên parvekirin, mirov di dorên bêrûmet de werin nîşandan. Her wiha, neçarkirina mirovan ji bo spaskirina xêrxwazan li ber kamerayê yan jî bikaranîna hejarî û belengaziya wan wekî reklam ji bo nîşandana qenciya bexşêner, qedexe ye.
- Nabe şert û mercên hejar, nexweş û bêhêzan ji bo bidestxistina dîtinan (view/trend) di bin navê "ronîkirina êşa wan" de were bikaranîn.

**Madeya Çarem:**

**Erk û Pîvanên Exlaqî:**

Ev made komek rêzik û nirxan dihewîne ku saziyên medyayê û xebatkarên vê sektorê pê pabend dibin. Ev pîvan çarçoveyekê ava dikin ku hevsengiyê di navbera azadiya medyayê û erkê wê ya agahdarkirina raya giştî bi şefafî û berpirsyarî de, çêdike; her wiha rêzgirtina li maf û rûmeta kesan wekî bingeh digire.

Di vê madeyê de ev xal hene:

**Yekem: Gotara Kînê/Nefretê**

Gotara kînê, yek ji xeternaktirîn şêwazên bikaranîna xirap a azadiya derbirînê ye. Têkoşîna li dijî wê, nayê wê wateyê ku azadiya derbirînê dijberê wê ye. Berovajî vê, kampanyayên nefretê bixwe azadiyê ditepisînin da ku civakên armanckirî bêdeng bikin û rê li ber medyayê bigirin ku karên wan aşkere neke.

Gotara kînê piranî bi gotinên hejîner dest pê dike (wek hevokekê di gotareke siyasî de, posteke kesekî navdar di torên civakî de yan jî karîkatûrekê), paşê bi rêya parvekirina zêde û demdirêj ji aliyê aliyên cuda ve, bandora wê berfireh dibe.

Dema ku zemînek amade hebe, çi ji ber mercên ewlehî, aborî, siyasî yan jî derûnî be, gotara kînê dibe sedema teqandina qeyranan di nav civakê de; bi taybetî di nav wan civakan de ku ji ber sedemên cuda tûşî cemsergirtinê bûne.

Gotara kîm û nefretê ya herî bi bandor ew e ku bi peyamên dubare, ji aliyê gelek aliyên cuda ve û di demeke dirêj de tê belavkirin. Ev gotar piranî bêyî ku balê bikişîne belav dibe; lê gava binpêkirinên mafên mirovan nêzîk dibin, tundî û dubarebûna wê bixweber bilind dibe.

Ezmûnên dîrokî nîşan didin ku bangên ji bo tundiya civakî, piranî encama kombûna gotara nefretê ya pêşwext û dubarekirî ne, ku di dema xwe de piraniya wan nebûbûn sedema metirsî û nîgeraniyê.

Ragihandin, hêla parastinê ya bingehîn e li hemberî hewildanên têkbirina ewlehî û aştiya civakî û parastina komên lawaz. Li ser vê bingehê, divê ragihandin ji gotara kîn û nefretê dûr bikeve û di heman demê de li dijî wê têbikoşe û metirsiyên wê aşkere bike.

Yasayên navdewletî gotara nefretê qedexe dikin. Yek ji wan "Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî" ye ku di madeya 20an de hatiye: "Her cure banga ji bo nefreta neteweyî, nijadî yan olî ku bibe sedema handana li dijî cudakarî, neyartî yan tundiyê, bi yasayê qedexe ye."

Gotara nefretê metirsiyeke rastîn e; ji ber ku tovê dubendî û parvebûnê diçîne, tundiyê geş dike û aştiya civakî têk dibe. Ji bo ku têkoşîna li dijî gotara nefretê zirarê negihîne azadiyên giştî, Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan a Neteweyên Yekgirtî "Plana Çalakiyê ya Rabatê" wekî rênmayek pêşniyar kiriye. Di vê planê de 6 pîvan ji bo naskirina gotara kîn û nefretê ya qedexekirî hatine diyarkirin:

- Çarçoveya civakî û siyasî ya gotarê.
- Sifet, meqam û asta bandora kesê ku diaxive.
- Mebesta sorkirinê li dijî komeke armanckirî.
- Naveroka gotarê û awayê pêşkêşkirina wê.
- Asta Belavbûnê û cemawerê wergir.
- Egera rûdana zirarê yan nêzikbûna rûdana wê.

**Pênaseya Gotara Kîn û Nefretê:**

Gotara nefretê; her cure naverokek (devkî, dîtbarî, bihîstyarî yan reftarî) ku li ser bingeha nasnameyê (ol, netewe, etnîk, nijad, reng, herêm, zayend, ziman, kêmendamî, nasnameya siyasî yan civakî —di nav de adet, cilûberg û devok jî hene) mirovan ber bi nefret, tundî, cudakarî yan dûrxistinê ve sor dike ye. Her wiha, naverokên ku rûmeta mirovan kêm dikin yan wan ji mirovahiyê derdixin jî, di nav vê pênaseyê de ne.

**Şêwazên Gotara Nefretê:**

1. Cudakarî.
2. Sivikatîkirin, rûreşkirin û biçûkxistin
3. Nijadperestî yan dûrxistin û gotarên ku banga û îzolekirina komî dikin.
4. Kilîşekirin (qalibên amade) yan lekedarkirina komî.
5. Binavkirina komekê bi sifetên ku wan ji mirovan kêmtir nîşan didin, da ku raya giştî tundiya li dijî wan bi hêsanî qebûl bike.
6. Sorkirin, berevajîkirina gefan û sûcdarkirin: Banga aşkere ya ji bo tundî yan dûrxistinê.
7. Tehrîfkirin, Tunekirin û înkar.

**1. Cudakarî:**

Dema ku di nav civakekê de têgehên "Em" û "Ew" werin bikaranîn, gotara kîn û nefretê belav dibe. Dûrxistina komekê ji çarçoveya "Em" (ku divê her kesî bihewîne), dibe sedem ku ew kom xwe wekî kesên "nayên naskirin" hîs bikin. Hingê "Yê din" êdî wekî beşek ji xaka hevpar nayê dîtin, lê belê wekî neyar yan jî astengiyek tê dîtin.

Cudakarî ew e ku kes yan kom, li ser bingeha reng, zayend, ol, nijad yan taybetmendiyên din, xwe ji yên din çêtir û jêhatîtir bibînin. Ev yek dibe sedem ku mafên kesên din werin binpêkirin, yan jî ew werin dûrxistin.

Cudakarî her wiha wan bangan yan nîşaneyan jî dihewîne ku dibe ku di yasaya Sûriyeyê de bi aşkere wekî tawan nehatibin pênasekirin, lê armanca wan ew e ku rê li ber kesan yan koman bigirin, da ku ji mafên

xwe yên bingehîn sûd wernegirin (wekî: mafê naskirina nasnameya çandî/zimanî, mafê rêxistinkirina sendîkayî, mafê gihîştina xizmetên giştî bêyî cudakarî û mafên kesên kêmendam).

**Îmzekerên vê rêziknameyê pabendî van xalên li jêr dibin:**

- Dûrketin ji her cure cudakariya di navbera cemawer de li ser bingeha ol, mezheb, nijad, ziman, zayend, çand yan reng.
- Danûstandina mirovî bi hemû kesan re, bêyî ti cudakarî yan berçavgirtina aliyên din; bi taybetî di dema romalkirina dozên qurbaniyan de.
- Qedexekirina bikaranîna zimanê cudakar di naverokên medyayê de; di nav de peyv yan hevokên rûreşker, alîgir yan jî yên ku rûmeta kes û koman kêm dikin.
- Qedexekirina her cure bijartina nepîşeyî ya ku di dozên giştî de rewayetiyê dide komekê li ser hesabê komeke din.
- Qedexekirina rewakirina cudakariyê di medyayê de, yan jî propagandakirina wê bi hinceta bawerî, çand yan adetên civakî.
- Qedexekirina piştguhkirin yan windakirina deng û berjewendiyên komên civakî yên diyarkirî di nûçeyan de; yan jî nîşandana wan wekî ku ji yên din kêmtir in.
- Qedexekirina cudakariya neyênî yan "erênî" ya ku dibe sedema bilindkirina asta komekê bi rengekî ku rûmeta komeke din kêm bike. Lê heke cudakarî bi mebesta rastkirina neheqiyeke li dijî komekê be û zirarê nede mafên kesên din, di çarçoveyeke rexneyî

û pîşeyî de dikare were kirin; bi mercê ku naveroka gotarê di cihê xwe de were şirovekirin û gava pêwîst be were şermezarkirin.

- Nekirina cudakariyê di hemû qonaxên berhemanîn naverokê de (hilbijartina mêvanan, çavkanî, sernav, wêne, vîdyo û koşeyên romalkirinê).
- Dabînkirina mafê bersivdayîn, rastkirin û lêborînê ji bo kesên ku bi awayekî rasterast yan nerasterast tûşî cudakariyê bûne.
- Îmzeker û xebatkarên saziyên ku ev rêzikname îmze kirine, pabend dibin ku hesabên xwe yên kesane ji bo belavkirina ramanên cudakar, kîndarî yan handanê bikar neynin.
- Rexneya babetyane ya li ser partî û koman azad e; bi mercê ku giştîkirineke neyênî li ser endamên wan koman neke, banga bêparkirina wan ji mafan neke û jiyana ti kesî nexe metirsiyê yan rûmeta wan neşikîne.
- Dema ku veguhestina gotineke cudakar yan rûreşker neçarî be, divê ev gotin di çarçoveya xwe de were pêşkêşkirin û were diyar kirin ku sazî vê gotinê red dike û napejirîne.
- Dûrketin ji tinazkirina bi mafê perwerdeyê, mafê beşdariya di karûbarên giştî de yan jî mafê karkirina di saziyên dewletê û sektorên taybet de.

**2. Buxtan, Navzirkirin û Biçûkxistin:**

Divê ji her cure buxtan, biçûkxistin û navzirkirina li dijî kesan, koman yan saziyan were dûrketin.

**Buxtan:** Her cure derbirîneke aşkere ye ku li dijî kes yan koman tê kirin; çêr, sivikayetî yan biçûkxistinê di nav xwe de dihewîne. Ev derbirîn bi devkî, bi nivîskî yan bi xêzkirinê pêk tê û armanca wê ew e ku hin sifetên xerab yan rûmetşikên ên ku tu bingeha wan a rastîn û taybet tune ye, li kes/koman bike.

**Navzirkirin:** Ew e ku mirov bi awayekî aşkere kesekî yan komekê bi karekî xerab tometbar bike; bi rengekî ku eger ew tawan rast bûna, dê ew kes bihatana cezakirin yan jî rûmeta wan bişikiya (wekî tometbarkirina kesekî bi dizî, bertîlxwarin yan destavêtinê). Ev yek bi gotin, nivîs yan xêzkirinê pêk tê.

**Biçûkxistin:** Her gotin, nivîs, xêzkirin, wêne, nîşan yan derbirîneke aşkere ye ku rûmet û rêzgirtina kes yan koman kêm dike.

Divê xebatkarên qada medyayê ji weşandina her materyalekê ku navzirkirin, zêdegavî û biçûkxistina li dijî kes û koman (di nav de kesên ku di karên giştî de dixebitin jî hene) di nav xwe de dihewîne, dûr bikevin.

**Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:**

- Nabe sivikatiyên rasterast, hevokên rûmetşikên yan rûreşker ên ku zirarê digihînin rûmeta mirovî ya her kesekî yan komekê, were kirin.
- Dûrketin ji navzirkirin û tometên bêbelge; nabe îdiayên wekî ji rê derketin, gendelî, tawan bêyî delîlên pêbawer yan lêkolînên dadwerî yên zelal werin weşandin yan dubarekirin.
- Rêgirtina li ber êrîşên kesane û reşkirina navûdengê mirovan bi rêya sifatên nebaş ên ku tu têkiliya wan bi berjewendiya giştî re tune ye.

- Qedexekirina şêwazê tinazkirin, qerf yan sivikayetiya bi mebesta rûreşkirina kes, kom yan saziyan.
- Qedexekirina navzirkirina komî û giştîkirina sifetên neyênî li ser komeke civakê yan saziyekê, li ser bingeha reftara kesekî yan bûyereke taybet.
- Medya nabe bi zanebûn bibe amûra reşkirina navûdengê xelkê. Nabe bi mebesta xirabkirina navê kes yan saziyan, gotin û helwestên wan werin berevajîkirin.
- Qedexekirina buxtan yan navzirkirina bêbingeh li dijî saziyên giştî, taybet yan rêxistinên civaka sivîl, bêyî delîl û hincetên babetyane.

**Azardan û Gihandina Ziyanê:**

Pêwîst e îmzeker haydar bin ku naveroka wan (çi bi zanebûn çi bêyî zanebûn) nebe sedema azardana derûnî, laşî yan darayî ya cemawer û zirarê negihîne berjewendiyên wan. Weşandina van materyalan tenê dema ku berjewendiyek giştî ya neçarî hebe û ti rêyeke din a veguhastina agahiyê tune be, gengaz e. Îmzeker di vî warî de pabendî van xalan dibin:

- Hişyarkirina cemawer berî nîşandana dîmen yan dengên ku dibe bibin sedema nerehetî û dilgiraniyê, yan jî trawmaya wan nû bikin.
- Di dema berhemanîna naverokên li herêmên sivîl ên ku şer lê heye, divê bal were girtin ku cih yan taybetmendiyên sivîlan neyên aşkerekirin, da ku ew di paşerojê de nekevin ber metirsiyê.
- Di dema romalkirina li herêmên operasyonên ewlehiyê yan li cihên tawanan de, divê ji nîşandana nîşaneyên nasînê yên milkên taybet

(wekî tabelayên dukanan yan plakeyên erebeyan) were dûrketin, da ku xwediyên wan tûşî ti zirarekê nebin.

**3. Nijadperestî:**

Her gotar yan reftareke medyayî ye ku hebûna "serdestî, paşdemayîn yan bindestiyê" ferz dike, yan jî bi awayekî rasterast yan nerasterast mirovan ber bi "sînordarkirina mafan, azardan yan binpêkirina prensîpa wekheviya di rûmet û mafan de" han dide. Nijadperestî, li ser bingeha ol, netewe, etnîk, nijad, reng, herêm, zayend, ziman, kêmendamî, nasnameya siyasî yan civakî (di nav de adet, cilûberg û devok jî hene) pêk tê.

Nijadperestî, yek ji xeternaktirîn reftaran e ku li dijî nirxên mirovî û peyama medyayê ye. Erkê medyayê bilindkirina hişmendiyê, xurtkirina dadperweriyê û avakirina raya giştî ya avaker e. Gotara nijadperest perçebûna civakî kûr dike û rasterast zirarê digihîne komên armanckirî.

Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:

- Dûrketin ji peyvên biçûkxistinê yan hevokên ku giştîkirineke kilîşeyî ya neyênî, rûreşker û biçûkxistinê dihewînin; yan jî nirxê kes û koman li ser bingeha nasnameyên wan kêm nîşan didin.
- Dûrketin ji bangên ji bo dûrxistin, îzolekirin, dersînorkirin, perçebûn yan bêparkirina ji mafan li ser bingeha nasnameyê.
- Dûrketin ji girêdana tawan yan reftareke neyênî ya kesekî bi koka wî ya nijadî, olî yan mezhebî ve; heta ku hinceteke medyayî ya pir zelal tune be.
- Dema ku veguhestina gotineke nijadperest pêwîst be, divê ev gotin di çarçoveyeke rexneyî de were pêşkêşkirin, redkirina vê

gotinê were diyar kirin û bal were kişandin ser giringiya lêpirsîna xwediyê wê gotinê.

- Nabe platform bi awayekî dubare ji bo wan kesên ku bi gotara "serdestiyê" têne naskirin, were dayîn.
- Pabendbûn bi yasayên niştimanî û pîvanên navdewletî yên ji bo têkoşîna li dijî nijadperestiyê.
- Xurtkirina hişmendiya cemawer derbarê metirsiyên nijadperestiyê de, ku çawa hestên nefretê û biçûkxistinê geş dike û bi dûrxistina mirovan ji civakê, jiyana wan dixe bin metirsiyê.

**4. Kilîşekirin:**

Mebest ji kilîşekirinê; binavkirina kesekî, komeke civakî, çandî, olî yan zayendî bi sifetên taybet e, bi mebesta ku rûmeta wan were kêmkirin yan jî raya giştî ber bi karvedanên diyarkirî ve were handan. Her wiha mebest jê, kurtkirina wêneya kesekî yan komekê di nav çend taybetmendiyên mezinkirî yan rûreşker de ye, ku wêneya wan a rastîn bi rengekî şaş tê nîşandan.

**Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:**

Kesên ku ev belgename îmze kirine, soz didin ku: Dema behsa mirov, kom û gelan dikin, her dem babetyane û durist bin. Qedexe ye ku sifetên giştî (bi taybetî yên xerab) li ser komeke civakê yan gelan bar bikin.

- Dubarekirina nîşandana sifetan li ser komekê bêyî hinceteke pîşeyî qedexe ye; divê ji zêdegotinên ku van sifetan di hişê cemawer de çêdikin, were dûrketin.

- Dûrketin ji giştîkirina reftarên kesane yan bûyerên sînordarkirî li ser komeke civakê, neteweyekê yan herêmekê.
- Hişyarkirina cemawer li hemberî metirsiyên stereotipkirinê û çawa ew hestên nefret, dûrxistin û biçûkxistinê geş dike, ku dibe sedema metirsiyê li ser komên armanckirî.
- Bikaranîna peyv yan hevokên ku giştîkirineke stereotîpî ya neyênî yan rûreşker li dijî kes û koman dihewînin, qedexe ye.
- Dûrketin ji her cure gotara nefretê ya ku navûdengê kesekî yan komekê reş dike.
- Dûrketin ji wan peyvên ku parvebûna nijadî, olî yan çandî xurt dikin; li şûna wan bikaranîna zimanekî rast û durist ku rastiyê bêyî ramanên pêşwext nîşan dide.
- Dûrketin ji stereotipkirina dîtbarî yan vegotinî; wekî nîşandana hin koman ku her dem di rewşên xirab de ne, yan jî nîşandana jinan tenê di nav rolên kilîşe yên sînorkirî de. Li şûna wê, bal were kişandin ser beşdarî û kedên erênî yên hemû koman.
- Nabe ti naverokekê ku wêneyên neyênî, tinazker yan rûreşker li ser komên ku bi piranî rastî lekedarkirinê dibin (wekî kesên kêmendam, nexweş, penaber, kêmneteweyên zayendî yan xebatkarên hin pîşeyên diyarkirî), bên berhemanîn.
- Pêdaçûna hûr di naveroka weşandî de, da ku were mîsogerkirin ku ti nîşaneyên nijadperestî yan kilşekirinê tê de nîn in.
- Beşdarkirina mêvan û axêveran cuda, û lêgerîna li çîrokên erênî yên ku qalibên amade dişkînin.

**5. Ji-mirovahîderxistin:**

Ji-mirovahîderxistin ew e dema ku hin komên mirovî bi hinceta ku ne şaristanî ne yan jî ji aliyê exlaqî ve kêm in, wekî kesên ku ne hêjayî heman mafan in werin dabeşkirin. Şibandina koman bi heywanan yan jî binavkirina wan wekî "kûvî/hov", di îdeolojiyên tepisêner û pergalên ku tundiya komî meşandine de (ji dagirkerî û koledariyê bigire heta şer û qirkirinê/jenosîdê), amûreke sereke bûye.

Ev rewş di heman demê de bi nîşandana hin koman wekî "biyanî" yan jî wekî beşekî ne-rastîn ê neteweyê xwe nîşan dide; bi vî awayî dûrxistina wan ji çarçoveya exlaqî û mirovî rewa nîşan didin.

**Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:**

- Dûrketin ji dabeşkirina komên mirovî wekî kesên ku ne hêjayî heman mafan in (bi hinceta ku kêm-şaristanî ne); her wiha bikarnenîna her sembol an nîşaneyeke ku rûmeta wan kêm nîşan dide.
- Bikarnenîna sifet yan şibandinên rûreşker ji bo her komeke mirovî.
- Nîşandana komên di nav civakê de wekî "biyanî" qedexe ye, nexasim ku yasayê mafê hemwelatîbûnê yan yê niştecîbûna rewa daye wan.

**6. Handan, Berevajîkirina Gefê û Barkirina Guneh:**

- **Handan (Incitement):**

Banga ji bo tundiyê, yek ji xeternaktirîn şêwazên gotara nefretê ye. Encamên vê dikarin ji êrîşên kesane destp pê bikin û heta kuûtin û qirkirina/jenosîda komî. Pir caran, bûyerên ku hêrseke mezin di nava civakê de çêdikin tên bikaranîna, da ku mirovan bi hinceta "parastina xwe" yan jî xizmên xwe, ber bi tundûtûjiyê ve bikişînin.

Gava ku gotara nefretê raya giştî qanî dike ku koma armanckirî di cewherê xwe de cuda ye, sedema pirsgirêkan e û ne hêjayî mafên wekhev e, her wiha gefek e li ser hebûnê; hingê belavkerên nefretê dikarin hêsantir agirê tundûtûjiyê geş bikin. Ev cure handan li gorî yasaya navdewletî ya mafên mirovan wekî tawan tê dîtin.

- **Berevajîkirina Gefê[4]:**

Ev şêwaz ji bo bawerkirina xelkê tê bikaranîn, da ku zirarê bigihîne komeke taybet. Di kampanyayên nefretê de, rastiya gefê tê berevajîkirin; anku tê îdiakirin ku koma armanckirî planên tepiskirin yan azardana kesên din dike.Bi vî awayî cemawer bi hinceta "parastina rewa" ya li hemberî gefên xeyalî/derewîn, ber bi tundiyê ve têne handan.

- **Lomekirin / Sûcdarkirin:**

Dema ku komeke taybet bi neheqî, wekî berpirsyara pirsgirêkên civakî, aborî, qeyranên tenduristî yan guhertinên çandî were nîşandan, gotara nefretê ava dibe.

Ev şêwaz piranî ji aliyê hin siyasetmedar û rojnamevanên populîst ve wekî taktîkek tê bikaranîn, da ku hêrsa cemawer ber bi komên lawaz

[4] Ev taktîk wekî 'berevajîkirina tometê' jî tê naskirin. Ew ji bo rewakirina tundiyê, gefên çêkirî tîne pêş; wekî ku li Ruwanda di sala 1994an de rû dabû.

(wekî penaberan) ve were arastekirin. Ev sûcdarkirin piranî li ser qalibên amade yên kevin ava dibe; ew kom wekî kesên "nayên bawerkirin" yan "jixwehez" tên nîşandan û bi dubarekirina gotegotan ev yek vediguhere teoriyên komployê.

**Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:**

- Dûrketin ji banga ji bo tundiyê; wekî handana kes, kom yan aliyên hundirîn û derveyî ji bo bikaranîna hêzê (wek azardana laşî, darvekirin, qirkirin yan girtina azadiyê) li dijî kes yan komekê.
- Dûrketin ji handana cemawer bi hinceta "parastina rewa" ya li hemberî gefên xeyalî yan bêbingeh.
- Dûrketin ji barkirina berpirsyariya pirsgirêkên aborî, tenduristî yan civakî li ser milê komekê yan kesekî bêyî delîlên zanistî û aşkere.

**7- Tunekirin, Înkar û Ladan:**

Ev şêwe; di tepisandin an înkarkirina rastiyên çespandî yên derbarê binpêkirinên giran ên mafên mirovan de ku li dijî komeke diyarkirî hatine kirin, xwe nîşan dide. Ev kiryar piraniya caran ji aliyê sûcdaran û piştgirên wan ve têne kirin.

Wek mînakeke dîrokî ya berbelav; bikaranîna propagandayên ku îdia dikin "ew xakên ji aliyê mêtingeran ve hatine dagirkirin, ji niştecîhên resen vala bûn." Her wiha, dibe ku komên serdest hebûn an navên civakên aramnckirî red bikin.

**Înkar:**

Înkar, ew her hewildanek ji bo redkirina rastiyên çespandî yên derbarê sûcên qirkirinê (jenosîd) an hovîtiyên komî de ye. Ev reftar di gelek yasayan de hatiye qedexekirin û her wiha rûmetdayîna sûcdarên van tawanên hanê jî, wekî sûc tê dîtin.

**Ladan (Tehrîf):**

Ladan, biçûkxistin an dubare pênasekirina sûcên qirkirinê û hovîtiyên komî ye, bi awayekî ku giraniya wan kêm bike yan berpirsiyariya wan lawaz bike, yan jî bi armanca jêbirina wan ji bîra giştî were kirin.

Her çend ev vegotin bi aşkereyî zimanekî tundrew nehewînin jî, lê di bingehê xwe de wekî "gotina nefretê" tên hejmartin; ji ber ku tenê ji bo armanca sivikatî yan azardanê têne bikaranîn.

**Îmzeker bi valan pabend dibin:**

- Dûrketin ji rûmetdayîn an pesndana sûcdaran.
- Dûrketin ji pesndana serdema zilmê ya ku gelê Sûriyeyê di bin desthilatdariya rejîma Sûriyeyê ya berê de pê re rûbirû maye; bi taybetî komkujî û sûcên ku ji sala 2011’an û vir ve yan beriya wê hatine kirin.
- Dûrketin ji pênasekirin an şirovekirina sûcên qirkirinê bi awayekî ku metirsiya wan kêm bike.
- Dûrketin ji sivikatîkirina bîra giştî ya wan civakên ku rûbirûyî sûcên li dijî mirovahiyê bûne.
- Dûrketin ji şêwandin/reşkirina wêneya qurbaniyan û biçûkxistina êş û azarên wan.
- Dûrketin ji nîşandana sûcdaran wekî mînak an lehengên ku bêne şopandin.
- Dûrketin ji anîna hincetan ji bo berdewamiya cudakarî, dûrxistin û dijminatiyê.

**Amûrên Ragihandinê di Têkoşîna li Dijî Gotara Nefretê de:**

1- **Piştrastbûn:**

Piştrastbûna ji rastiya agahiyan ji beriya weşandinê, amûra herî girîng a rûbirûbûna gotara nefretê ye; ji ber ku gotara nefretê bi piranî xwe dispêre agahiyên şaş û xapînok. Nabe ku leziya rojnamevanî yan zexta weşandinê, bikeve pêşiya pêvajoya piştrastbûna ji rastiyan, çavkaniyan û mafê bersivdayînê.

Heger agahiyek ne piştrastkirî be, divê di naveroka ragihandinê de ev yek bi aşkereyî were diyarkirin, da ku raya giştî li hemberî xapandinê were parastin, li gorî prensîpa "xweparastina pêşwext".

2- **Rêzgirtina li Cihêrengiyê:**

Rêzgirtina li cihêrengiyê û naskirina hemû civak, çand, nirx û baweriyên wan, yek ji amûrên sereke yên têkoşîna li dijî gotara nefretê ye. Di dema nivîsandin an pênasekirina nasnameyên olî, etnîkî, zayendî yan çandî de, divê zimanekî hûr, rast û dûrî provokasyon û qalibên amade were bikaranîn.

3- **Dûrketin ji Wêneyên Qalibî:**

Divê mirov ji wan wêneyên qalibî yên ku hin taybetmendiyên diyarkirî bi komekê ve dizeliqînin dûr bikeve. Di dema pêşkêşkirina naverokê de, divê rêbazên wisa werin girtin ku hestiyariya li hemberî qalibên nehişyar û pêşbîniyên kevin li ber çavan bigirin.

4- **Nûnertiya Hemû Aliyan:**

Kesên ku ev belge îmze kirine, divê nûnertiya hemû aliyan bikin, ne tenê nûnertiya serkirdeyan an ya piraniyê, her wiha divê bibin dengê kesên ku nikarin xwe bînin ziman. Ji bo misogerkirina vegotineke berfireh,

pêwîst e nêrînên hemû komên ku bandor li wan bûye werin nîşandan û nabe ku tenê nêrîna aliyekî were pejirandin.

5- **Dûrxistina Dengên Tundrew û Hestiyarî:**

Divê rê neyê dayîn ku nêrînên neasayî û bihest werin mezin nîşandan.. Gelek caran dengên tundrew di medyayê de ji qebareya xwe ya rastîn bêtir cih digirin û ev yek dibe sedema paşguhkirina dengên nermrew. Xwediyên nêrînên tund dixwazin balê bikişînin ser xwe, ku ev jî dibe sedema belavbûna nêrînên wan di nav civakê de û zêdebûna tirs û nefretê.

6- **Hişyarbûna li Hamberî Naverokên Şarandinê yên li Ser Medyaya Civakî:**

Divê medya parvekirinên hestiyarî yan gurkirinê yên li ser medyaya civakî, wekî nîşaneya rastîn a raya giştî nebîne. Nêrîn û şiroveyên li ser van platforman, ji ber cudahiya dîjîtal û algorîtmayên platformên bazirganî (yên ku belavbûnê dixin pêşiya rastî û nermrewiyê), piranî ne rast û ne kûr in. Ji ber vê yekê, divê aliyên îmzekar di dema veguhastin an jêdergirtina van nêrînan de gelekî hişyar bin.

7- **Dûrketin ji Mezin-nîşandanê ya ku Dibe Sedema Nefretê:**

Aliyên îmzekar divê di pênasekirina rûdan û diyardeyan de, ji mezin-nîşandanê/mubalexe û dayîna biryarên nirxî dûr bikevin. Ev yek rê li ber hestên ku nefretê gur dikin digire, zeraran kêm dike û nahêle raya giştî ber bi têgihiştin û pêşbîniyên çewt ve biçe.

8- **Dûrketin ji Sernavên Zirardar û Provokatîf:**

Divê medya ji bo kişandina bala temaşevanan, ji bikaranîna sernavên provokatîf ên ku hest û hesasiyetên civakî sor dikin û nefretê gur dikin, dûr bikeve.

**Duyem: Buxtan û Tohmetbarkirin:**

Divê mirov ji derewên bi mebest, şêwandin an parçekirina rastiyan dûr bikeve. Her wiha, nabe ku tohmet an binpêkirin û sûc bêyî belgeyên yasayî yan biryarên dadgehê yên piştrastkirî, li ser kesên din werin bar kirin.

**Buxtan:**

Ew derewa ku li ser bingeha afirandina rûdan an gotinan hatiye avakirin û bêyî ti belge yan bingehên madî li kesên din tê barkirin e.

**Tohmetbarkirin:**

Ew tometbarkirina kesekî din a bi kirina tawanekê bi neheqî ye. Ev yek wekî êrîşa li ser rûmet, navûdeng û rûmeta mirov tê hejmartin. Ev reftar dadgehan û raya giştî dixapîne û rê li ber biryarên neheq û û helwestên civakî yên stemkarane vedike.

**Aliyên îmzekar pabendî van xalan ve dibin:**

- Dûrketin ji derewên bi mebest, şêwandina rastiyan an parçekirina wan û her wiha dûrketin ji tohmetbarkirina bêbingeh.
- Dûrketin ji gumankirina binpêkirinan an zeliqandina sûcan bi kesên din ve, bêyî îsbata yasayî yan biryarên zelal ên dadgehê.
- Hişyarbûn li hemberî encamên yasayî yên ku ji buxtan û tohmetbarkirina neheq a li dijî kesan yan koman derdikevin."

**Sêyem: Rêzgirtina li Azadiya Ramanî, Bawerî û Derbirînê:**

- **Azadiya Ramanî:**

Mafê her kesî ye ku bibe xwedî bawerî, nêrîn û ramanên taybet û di qadên cuda de xwedî dîtin an ravekirinan be; heta ku ev raman nebin kiryarên ku gefê li kesên din bixwin, nebin sedema cudakariyê, handana li ser nefret û tundiyê, dûrxistina komekê ji mafên wê, têkbirina aştiya civakî an gurkirina fitneyê.

- **Azadiya Baweriyê:**

Mafê mirov e ku bi awayekî aştiyane perestinên (îbadet) xwe yên olî bike û baweriya xwe bîne ziman, yan jî dest ji wan berde. Divê ev maf bi rûmeta mirovî re li hev be; bêyî ku ti kes ji ber nasname û bijardeyên xwe yên olî yan ramanî, rûbirûyî zorê, çewisandin yan bi kêmkirina mafan bibe.

- **Azadiya Derbirînê:**

Mafê kesan û koman e ku nêrîn, raman û helwestên xwe bi amûrên cuda yên wekî nivîs, medya, huner, civîn û xwepêşandanên aştiyane bînin ziman, bêyî ku ji ceza an cudakariyê bitirsin. Mercê vê azadiyê ew e ku di nav de handana li ser nefret û tundiyê yan binpêkirina mafên kesên din tune be.

- **Berpirsiyariyên Medyayê:**

- Medya xwe ji weşandin an belavkirina her şêweyek gotara nefretê, handana li ser tundiyê yan cudakariya li ser bingeha ol, mezheb, raman û nêrînan dûr dixe.
- Li ser medyayê qedexe ye ku zimanê sivikatiyê yan yê tinêzkirinê li hemberî her baweriyeke olî, ramanî yan siyasî bikar bîne.
- Li ser medyayê qedexe ye ku bi rêya naveroka xwe, nêrîn an arasteyên ramanî, olî û siyasî li ser raya giştî ferz bike.

- Li ser medyayê qedexe ye ku ji ber bawerî, raman an helwestên siyasî, rûyê kesan an koman reş bike.

**Aliyên îmzekar pabendî van xalan dibin:**

- Qedexe ye ku zanyariyên kesane yên derbarê bawerî, raman an nasnameya siyasî ya kesan de aşkere bike, bêyî ku razîbûna wan a aşkere werbigire.
- Qedexe ye ku medya nêrînên dijber dûr bixe yan wan bêdeng bike, eger ew nêrîn nabin sedema handana tundiyê yan binpêkirina qanûnê.
- Qedexe ye ku medya propagandayê ji bo wan gotarên olî yan mezhebî bike, ku armanca wan betalkirina baweriyên kesên din e yan jî rewayiya wan jê distîne.
- Mijarên olî û aqîdeyî dikarin ji bo armancên zanistî, diyalog an rexneyên akademîk werin nîqaşkirin, bi mercê ku zimanekî bi rêz û berpirsiyar were bikaranîn.
- Qedexe ye ku hinceta "azadiya derbirînê", nûçeyên derew, parçekirî yan xapînok werin weşandin.

**Çarem: Rêzgirtina li Nirxên Olî, Çandî û Civakî:**

Rêzgirtina li nirxên olî, çandî û adetên civakî, erkekî pîşeyî û exlaqî ye ku aştiya civakî diparêze, pêkvejiyanê xurt dike û cihêrengiyê dewlemend dike. Piştguhkirina van nirxan, rê li ber lihevketinên civakî û cemsergirtinên xeternak vedike ku dibe veguherin şer û nakokiyan. Ev yek medyayê li dijî cemawerê wê derdixe û rola medyayê ya wekî amûra têkilî, têgihîştin û aştiyê ji holê radike.

UNESCO di Daxuyaniya Cihêrengiya Çandî ya sala 2001an de û her wiha Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî tekez dikin ku azadiya

derbirînê nayê wateya sivikayetiya bi bawerî yan adetan; berovajî vê, azadî daxwaz dike ku bi berpirsyarî rêz li cihêrengiya olî û çandî ya di nav civakan de were girtin.

Hestiyariya civakî; ew koma wan bawerî, adet, sembolên olî, çandî û civakî ye ku têkiliya civakê bi naveroka medyayê re diyar dike. Ev hestiyarî beşeke bingehîn a rastiya civakî û çandî ya cihêreng a Sûriyeyê ye.

**Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:**

- Nabe ti naverokek ku sivikayetiyê bi bawerî, rîtuel, sembolên olî, çand, adet yan cilûbergan dike yan jî tinazê xwe bi wan dike, were weşandin an belavkirin.
- Di dema romalkirina mijarên olî de, divê pabendbûn bi ruhekî rêzdar, babetyane, têgihîştî û dûrî ramanên pêşwext bê kirin.
- Kontrolkirina hûr a termînolojiyê û baldarî di dema girtina dozên olî de; her wiha handana rojnamevanan li ser pisporbûna di van mijaran de.
- Nirxandina hestiyariya wêne û peyvên ku dibe wekî biçûkxistina ol, bawerî yan adetan werin dîtin.
- Divê bi rêzdarî nêzîkî adet û kevneşopiyan bibe, wan wekî parçeyek ji nasnameya çandî pêşkêş bike û her dem handana rêzgirtina li wan bike.
- Giringîdayîna bi cihêrengiya çandî û zimanî wekî dewlemendiyeke mirovî; ligel ronîkirina aliyên wan ên dîrokî û civakî.

- Nîşandana adetên civakî (wekî zewac, xwarin, cilûbergên gelêrî, şîn, cejn) wekî beşeke giring a cihêrengiya çandî û xurtkirina pêkvejiyana civakî.
- Barnekirina berpirsyariya paşvemayînê, qeyranên aborî yan binpêkirina mafên mirovan tenê li ser milê adetekê. Divê bi baldarî serederî bi adetên bizarar û mafên mirovan re were kirin û ji bo rastkirina wan bi rêya bername û kampanyayên hişyariyê yên zanistî hewildan were kirin.
- Hêrskirina hestên komeke civakê yan jî rexnekirina rûreşker a li dijî urf û adetên rûniştî, qedexe ye.
- Ronîkirina dozên ku dibe li hin cihan rastî nerazîbûna civakî werin (wekî mafên jinan, azadiya jinê, zewaca temenbiçûkan/zarokan û hwd.) bi zimanekî berpirsyar ku çarçoveya civakî li ber çav digire û piştî lêkolînkirina aliyên wan ên civakî û yasayî.
- Avakirina hevsengiyê di navbera mafê derbirînê û berçavgirtina taybetmendiyên civakî yên herêmî de.
- Di dema romalkirina meydanî de, pabendbûna bi rêzgirtina li urfên civakê yên derbarê cilûberg, rûniştin û şêwazê axaftinê de.
- Romalkirina an weşandina bûyerên ku handana nefretê li dijî komekê li ser bingeha adet, çand yan paşxaneya civakî dike, qedexe ye.
- Qedexe ye ku wêne û dîmenên erotîk yan jî dîmenên rûreşker û li dijî edetên giştî werin weşandin.
- Di dema vegirtina mijarên olî, civakî yan çandî de, divê hemû nêrînên alîgir û dijber bi hevsengî werin nîşandan. Her wiha,

pêwîst e rastiya agahiyên tên belavkirin were piştrastkirin, da ku nebin sedema rûreşkirin yan biçûkxistina tu pêkhateyeke civakê.

- Bikarnenîna adet yan sembolên çandî û olî wekî amûrekê ji bo heyecanê yan zêdekirina dîtinan li ser hesabê aştiya civakî û rêzgirtina li civakê.
- Rastbûn di berhemanîna naverokên têkildarî ol, etnîk û çandên herêmî de; her wiha cudakirina di navbera mantiqê dîrokî û çarçoveyên cuda yên civakan de.
- Pabendbûn bi şêwira bi pispor û lêkolînerên herêmî re dema ku pêdivî hebe, da ku çarçoveya mijarê rast were fêmkirin û ramanên pêşwext neyên ferzkirin. Her wiha pêwîst e piralîkirina nêrînan were misogerkirin û civakek bi temamî di ramanê kesekî de neyê kurtkirin.

**Berhemanîna naveroka têkildarî dozên olî û civakî:**

Dema hilberîna naverokên têkildarî mijarên olî, çandî yan civakî yên hestiyar, îmzeker pabendî van xalan dibin:

- Berçavgirtina goşeyên wênegirtinê û pîroziya cihan; nabe rîtuel yan merasîmên olî veguherin materyalekî şahî, tinaz yan qerf û henekan.
- Romalkirinê rîtuelên olî, pîrozbahî, şîn yan demên taybet (cejn, rojên şînê, merasîmên taybet) divê bi baldarî were kirin, wek rêzgirtin ji taybetmendî û çarçoveya wê re.

- Cudakirina di navbera "rexneya rewa" ya li dijî adet, yasa yan reftarên ku neheqî û cudakariyê dikin, û di navbera "biçûkxistina civakê" ya ku bi rêya tinaz, dijûn yan rûreşkirinê pêk tê.
- Dayîna derfetê ji bo piralîbûna ramanan di dozên hestiyar de; nabe tenê ramaneke parêzkar yan tenê ramaneke lîberal were pêşkêşkirin. Divê hevsengî hebe û ti alî neyê rûreşkirin.
- Hişyarî li hemberî wê yekê ku hinek rojên taybet (olî, neteweyî, sembolîk) xwedî enerjiyeke hestiyar a bilind in. Tinazkirina bi van rojan di demên diyarkirî de, dibe ku agirê alozî û nakokiyan geş bike û zirarê bigihîne aştiya navxweyî.
- Dema ku nakokî di navbera mijareke hestiyar a civakî û prensîpên mafên mirovan de derkeve, mafên mirovan (bi rêzgirtina li rûmeta mirovî) tên biderpêşkirin; di vî warî de zimanekî ku aloziyê kêm dike û cemsergirtinê gur nake, tê bikaranîn.

**Pêncem: Romalkirina Pevçûnan û Dadperweriya Veguhêz:**

Danîna rêzikên pîşeyî û exlaqî ji bo rojnamegeriya hestiyar a li hemberî pevçûnan û dadperweriya veguhêz, roleke giring di veguhastina rastiyan û di çespandina aştiyê de dilîze; nexasim di dema romalkirina dozên dadwerî û pevçûnên navxweyî de.

Romalkirina nakokiyên civakî, çandî, olî, qeyranên siyasî û şeran di pîşeya rojnamevaniyê de gelekî metirsîdar e. Romalkirina neberpirsyar dikare bibe sedema zêdebûna kuştinê û kûrkirina parvebûnê; her wiha

dikare agirê tundiyê di nav cemawer de geş bike, hestan gur bike yan jî bibe sedema çekdarkirina civakê ku rê li ber tawan û şer vedike.

**Îmzeker di dema rolamkirina dozên dadperweriya veguhêz yan pevçûnan de, pabendî van xalên li jêr dibin:**

- Rêzgirtina li "prensîpa bêgunehiyê" ya gumanbaran; nabe berî biryara dadgehê wekî sûcdar werin nîşandan. Divê derfeta parastina mafê wan were dayîn û wekî "gumanbar" werin binavkirin.
- Dayîna qadeke guncan ji bo qurbanî û kesên rizgarbûyî, bi mercê ku rûmeta wan neyê birîndarkirin û zirar negihe pêvajoya aştiyê.
- Nabe qurbanî wekî "hejmar" werin nîşandan; divê her dem aliyê wan ê mirovî, çîrok û bandora wan were ronîkirin.
- Rewanekirina binpêkirinan yan biçûkxistina wan (bi rengekî ku zirarê bigihîne qurbaniyan) qedexe ye. Divê were mîsogerkirin ku nîşandana binpêkirinê nebe hincet ji bo tolhildanê.
- Weşandina îdiayên têkildarî tawanan bêyî piştrastkirina rastiya wan, qedexe ye.
- Di dema romalkirina nûçeyên dadgehê de, divê rûyê şahid, qurbanî û girtiyan were veşartin (nenasîkirin) û sedema vê veşartinê ji cemawer re were şirovekirin.
- Nabe hûrgiliyên li ser şahid, qurbanî û sûcdaran, yan jî cihê niştecîbûnê û nasnameyên wan, werin weşandin.
- Pesndan yan rûmetdayîna bi sûcdarên binpêkirinan (çi di naverokên medyayê de, çi di bernamayên şahiyê, rêzefîlm, semîner yan gotarên ramanî de be) qedexe ye.

- Pabendbûn ku romalkirina pêvajoyên dadperweriya veguhêz (komîsyonên rastiyê, dadgehkirin, qerebûkirin) bi baldarî û hevsengiyeke bilind were kirin; her wiha piştrastbûn ku nûçe bandoreke neyênî li ser pêvajoyê nake.
- Dayîna derfetê ji bo qurbaniyên hemû aliyan, bêyî ku sûcdar û qurbanî werin wekhevkirin û bi parastina mafên qurbaniyan.
- Berhemanîn çi naverokekê ku armanca wê bandorkirina li ser herikîn yan encamên dadgehkirinê be, qedexe ye.

**Îmzeker di dema romalkirina nûçeyên pevçûnan de, pabendî van xalan dibin:**

- Dûrketin ji propagandaya ji bo binpêkirina yasayê yan wergirtina mafan bi rêya hêzê (bi hinceta hevsoziya bi qurbaniyên şer re).
- Piştgiriya terorê û tawanên sîstematêk, nîşandana serkeftina wan yan pesndana sembolên wan, qedexe ye.
- Dayîna derfetê ji bo aliyên ku bandor li wan bûye (sivîl, rêxistin, qurbanî) da ku dengê xwe bigihînin.
- Weşandin, belavkirin yan dubarenekirina daxuyaniyên ku mirovan ber bi tundî, cudakarî yan tolhildanê ve han didin, qedexe ye.
- Di dema romalkirina pevçûnan de, divê bal li ser gotara aştiyê û çarçoveyên dîrokî, civakî û siyasî were kişandin. Divê gotar û bûyerên komker werin bikaranîn û ji vegotinên ku aliyekî wekî "qurbaniya mutleq" û aliyê din wekî "sûcdarê mutleq" nîşan didin, were dûrketin.
- Berî dayîna derfetê yan platformê, divê "ajandeyên" çavkanî û mêvanan werin kontrolkirin.

- Nabe naverokên ku tundiyê rewa nîşan didin, yan jî tundiyê wekî çareseriya tekane ya nakokiyan pêşkêş dikin, werin berhemanîn.
- Derxistina pêş a karên erênî yên ku di xizmeta diyalog, lihevhatin û hewildanên mirovî de ne.
- Di dema pevçûnan de, li şûna mezin-nîşandana gotara nefret û parvebûnê, divê bal zêdetir li ser çîrokên serkeftî yên pêkvejiyanê û çareseriyên erênî be.

**Saziyên medyayê divê di siyasetên xwe yên hewalsaziyê de van rêzikan misoger bikin:**

- Piştrastbûn ku weşandina materyalên hestiyar, piştî wergirtina razemendiyan û di bin çavdêriya komîteyên exlaqî de ye.
- Şirovekirin û ronîkirina yasayên herêmî û peymanên navdewletî yên têkildarî gotara nefretê.
- Berfirehkirina mekanîzmayên lêpirsîna navxweyî ji bo wan rojnamevanên ku gotara nefretê bikar tînin.
- Amadekirina lîsteyekê ji bo term, hevok û reftarên qedexekirî; ligel pêşniyarkirina alternatîfên pîşeyî yên guncan ji bo wan.

**Şeşem: Cihêrengî:**

Çespandina cihêrengiyê di nav saziyan, naverokan û damezirandinê de, baweriyeke mezintir û romalkirineke berfireh dide saziyan; her wiha kalîteya naverokê bilind dike, hejmara cemawer zêde dike û domdariya saziyê mîsoger dike. Civaka Sûriyeyê xwedî gelek pêkhateyan e û her

xebateke medyayî divê rêzê li vê cihêrengiyê bigire. Piştguhkirin yan dûrxistin, nefretê diafirîne û baweriya gel bi medyayê kêm dike. Divê cudahî, wekî çavkaniyekê ji bo dewlemendkirina zanînê û xurtkirina pêkvemana civakî were pejirandin.

Sazî û îmzeker pabend dibin ku bi van rêyên li jêr cihêrengiyê biparêzin:

- Pabendbûn bi siyasetên ku çavkaniyên mirovî (HR) li ser bingeha "zayend, kok, herêm, kêmendamî, nasnameya neteweyî, olî yan siyasî" cudakariyê di navbera xebatkaran de nakin.
- Sazî pabend dibin ku di odeyên nûçeyan û di astên biryardayînê de, cih bidin nûnerên komên lawaz, li gorî dabeşkirina Neteweyên Yekbûyî.
- Sazî mîsoger dikin ku zemîneke kar ava bikin ku tê de zêdegavî, tinazkirin û cudakarî qedexe bin.
- Sazî piştgiriya gotûbêjên pîşeyî dikin û rêzgirtina li cudahiyan xurt dikin.
- Sazî di naverok, çavkanî, herêm û pêkhateyên di çarçoveya xwe ya erdnîgarî de, cihêrengiyê bicih tînin.
- Girêdana siyasetên cihêrengiyê yên hundirê saziyê bi siyasetên romalkirinê re; da ku piralîbûna paşxaneyên xebatkaran di piralîkirina goşe û mijarên nûçeyan de xwe nîşan bide, ne di kûrkirina parvebûnê de.
- Danûstandina bi hemû kesan re li ser bingeha hemwelatîbûn û wekheviyê.

- Divê sazî siyaset û zimanekî edîtoriyê bipejirînin ku rêzê li cihêrengiyê bigire û çîrokên erênî yên hemû pêkhateyan derxe pêş.

**Heftem: Dadperwerî:**

Dadperwerî prensîpeke bingehîn e ku xwe dispêre wekheviya di maf û erkan de û misogerkirina dadweriyê di navbera hemû kes û koman de, bêyî ti cudakariyê. Ligel lêpirsîna kesên ku yasayê binpê dikin, yan êrîşî mafan dikin, her wiha mirovên bêhêz û piştguhkirî diparêze, da ku hevsengiya civakî were avakirin û rûmeta mirovî were parastin.

**Heştem: Aşitiya Navxweyî û ya Cîhanî:**

**Aşitiya Navxweyî:**

Rewşa pêkvejiyana aştîyane ya di navbera pêkhateyên civakê de ye. Ev aştî xwe dispêre rêzgirtina dualî û naskirina cihêrengiyê; her wiha tundî, cudakarî û dûrxistinê red dike. Armanca wê xurtkirina ewlehiya civakî, rêgirtina li ber nakokiyên navxweyî û misogerkirina yekîtî û aramiya civakê ye. Herwiha ev aştî, rûmetdayîna bi sembolên binpêkirinên giran, sûcdarên şer û serokên mîlîsên ku komkujî kirine yan jî spîkirina navê wan, bi hincetên mirovî yên rûkalî qedexe dike.

**Aşitiya Cîhanî:**

Hevkarî û têgihîştina di navbera gel û dewletan de ye, ku dûrî şer, êrîşkarî û serdestiyê be. Ev aştî nirxên mafên mirovan û dadperweriya

navdewletî xurt dike, û hevkariyê di rûbirûbûna pirsgirêkên hevpar (wekî hejarî, karesat û guhertina avhewayê) de pêş dixe.

- Handana ji bo tundî yan şer bi rêya weşandin û parvekirina gotarên ku banga tundiya çekdarî, pevçûnên navxweyî yan şerê di navbera gelan de dikin, qedexe ye.
- Geşkirina fitne û parvebûnan yan mezin-nîşandan û derxistina nakokiyên mezhebî, nijadî, neteweyî yan siyasî yên ku aştiya navxweyî dixe metirsiyê, qedexe ye.
- Rewanekirina tawanên şer, binpêkirinên mafên mirovan yan jî her cure tepisandin û neheqiyê di medyayê de.
- Nabe serederî bi gotara nefret, cudakarî yan dûrxistinê re, wekî "ramana azad" were kirin; her wiha nabe qadeke wekhev a bi qasî gotara aştiyê, ji vê gotara nefret re were dayîn.
- Têkdana bi zanebûn a hewildanên aştiyê yan têkbirina destpêşxeriyên herêmî û navneteweyî yên ku ji bo dadperwerî, lihevhatin û aştiyê ne, qedexe ye.
- Propagandakirina çanda tolhildanê yan bikaranîna hêzê wekî rêya çareserkirina nakokiyan (li ser hesabê diyalog û danûstandinê), qedexe ye.
- Di romalkirina pevçûnan de, alîgiriya ku êrîş û neheqiyê rewa nîşan dide yan jî qurbaniyan piştguh dike, qedexe ye; ev yek binpêkirina prensîpên dadperwerî û hevsengiyê ye.
- Medya pabend dibe ku rêzê li prensîpên bingehîn ên peymanên navdewletî (yên derbarê parastina rûmeta mirovî, parastina mafên kesên kêmendam, kesên bê karîn, jin, zarok û nûciwanan û

têkoşîna li dijî bazirganiya mirovan) bigire. (Li Madeya Sêyem a Rêziknameyê binêre).

- Medya pabendî nirxên xurtkirina dadperwerî û aştiya navxweyî û ya cîhanî dibe; her wiha çanda pêkvejiyan û mafên mirovan belav dike. Rewakirina tundî, cudakarî yan binpêkirinan, handana ji bo fitne û pevçûnan yan her reftarekê ku aştiya navxweyî û ya cîhanî têk dibe, li ser medyayê qedexe ye.

**Madeya Pêncem:**

**Pîvanên Pîşeyî**

**Yekem: Hevsengî û Dadmendî:**

Mebest ji hevsengî û dadmendiyê; pabendbûna xebatkarên medyayê ye bi nêzîkiyeke pîşeyî ya wekhev ji hemû aliyên bûyerê re. Divê di dema romalkirinê yan nirxandina nûçeyê de, alîgirî ji bo ti kes yan aliyan neyê kirin. Pêwîst e agahî bi rengekî babetyane werin pêşkêşkirin û ji ramanên kesane yan gumana pêşwext werin veqetandin.

Hevsengî nayê wê wateyê ku ji bo îdiayên bêbingeh yan gotara nefretê, bi qasî rastiyên belgekirî, qadeke wekhev were veqetandin. Her wiha, hevsengî nîşandana du nêrînan ferz nake, heke nêrînek ji wan li ser bingeha agahiyên xapînok yan înkarê ava bûbe.

Têkbirina hevsengiyê, lîstina bi agahdariya giştî û binpêkirina aşkere ya berpirsyariya pîşeyî û exlaqî ye; ev yek dibe sedema windakirina baweriya cemawer bi saziyên medyayê. Dûrketin ji romalkirina alîgir, şertê bingehîn ê parastina baweriyê ye. Bi vî awayî sazî naguhere amûreke propagandayê û rola xwe ya wekî çavkaniya zanînê diparêze.

Hevsengî hingê pêk tê; gava wêneyeke berfireh û zelal li ser bûyer û mijaran were pêşkêşkirin, nêrîn û meylên cuda bêyî dûrxistin yan alîgirî werin nîşandan, û derfet ji cemawer re were dayîn ku ramanên xwe li ser bingeha agahiyên kamil û pêbawer ava bikin, dûrî zext û bandorên derveyî.

**Li ser vê bingehê, îmzeker ji bo mîsogerkirina hevsengî, dadmendî û bêalîbûnê pabendî van xalên li jêr dibin:**

- **Hevtayî:** Pêşkêşkirina hincet û daneyên bingehîn ên hemû aliyan; derxistina pêş a wan xalên ku alîkariya cemawer dikin ku bûyerê bi rengekî dadperwer û berfireh fêm bike.
- **Bêalîbûn:** Neketina bin bandora dîtinên kesane yan ramanên pêşwext; danûstandina bi rastiyan re divê bi babetyane, piştrastbûn û hûrgiliyên rast be.
- **Alînegirî:** Nepejirandina helwestên pêşwext (çi alîgir çi dijber) li hemberî ti aliyan; pêşkêşkirina nêrînên piralî û tevlînekirina ramanên kesane di nav naverokê de, da ku şefafiyeta rastiyan were parastin.
- **Mijarên Hestiyar:** Di mijarên wekî (ol, siyaset, têkiliyên mirovî, reftarên zayendî, dozên darayî yên aloz) de, divê sazî û îmzeker asta herî bilind a rastbûn û babetbûnê biparêzin û bi ti awayî ramanên xwe yên kesane tevlî romalê nekin.
- Dabînkirina hevsengiyeke rastîn di pêşkêşkirina nêrînên (alîgir û dijber); girtina dest a hemû nêrînan û piştguhnekirina ti daneyên bingehîn ên ku hêjayî bên dayîn.
- Balê ne bi tenê bide aliyekî dozê; divê ji pêşkêşkirina nêrîneke yekalî were dûrketin.

- Parastina hevsengiya nêrînan û nehiştina ti kêmasiyeke ku zirarê digihîne babetbûna romalê.
- Dûrketin ji wan şêwazên romalkirinê yên ku dibe rûmeta beşek ji cemawer bişikînin yan nêrînên wan piştguh bikin.
- Serederiyeke dadmend bi kesên ku ramanên xwe tînin ziman û dayîna derfetê ji bo bersivdayîna pirsên hatine kirin.
- Dabînkirina mafê bersivdayînê (piştî weşandinê) ji bo wan aliyên ku nêrînên wan nehatine pêşkêşkirin yan derfeta beşdariyê nedabûn wan.
- Divê neyê gotin ku beşdar, pispor û akademîsyen her dem "bêalî" ne; nexasim dema pêwîst be, divê bal were kişandin ser paşxane û meylên wan.
- Cudakirina di navbera Raman û Rastiyê de, di hemû qonaxên berhemanîn û weşandinê de.
- Heke di dema nûçeyên lezgîn yan bûyerên ji nişkê de, hevsengiya yekser pêk nehatibe, divê di fersenda herî nêz de bi rêya rapor yan bultenên paşê re, ev hevsengî were temamkirin.
- Dema şahidiya qurbanî yan ziyandîtiyan tê pêşkêşkirin, divê were diyar kirin ku ev nêrîneke kesane ye û tenê aliyekî çîrokê nîşan dide, da ku cemawer di vê rastiyê de hişyar be.
- Di nîqaşên li ser torên civakî de, divê cemawer were parastin da ku nefikire ku saziya medyayê nêrînên beşdaran dipejirîne. Ev yek bi van xalan pêk tê:
    1. Diyarnekirina ti piştgiriyê ji bo nêrînên kesane yan kampanyayên reklamî yên bikarhêneran.

2. Cudakirina zelal a di navbera naveroka saziyê û naveroka ku ji aliyê cemawer ve hatî zêdekirin û nîşandana vê cudahiyê di platformên dîjîtal de.
3. Nîşandana zelal a çavkaniyan di materyalên rojnamevaniyê de, da ku nêrîn û agahî tevlihev nebin û rastiya naverokê biparêze.

- Di hevpeyvînan de, dayîna derfetên wekhev (ji aliyê dem, qade û mercan ve) ji bo hemû aliyan, da ku nêrînên xwe bêyî cudakarî bînin ziman.
- Dayîna qadeke domdar ji bo komên bêhêz û lawaz di nûçeyan de; her wiha amadekirina zemînê da ku ew jî li gel kesayetên bi bandor û çalak ên di qada giştî de werin nîşandan.
- Pabendbûn bi babetbûnê û bikaranîna zimanekî hevseng ê ku ji nêrînên pêşwext yan sifetên nirxandinê dûr be.
- Pêşkêşkirina nêrîn û bersivan wekî xwe; bêyî ladan, yan jêkirin yan dubare dariştinê, ku wateya wan lawaz dike yan çarçoveya wan diguherîne.
- Pêkanîna hevsengiyê di navbera nêrînên dijber de, çi ji aliyê dem û qada weşandinê ve, çi jî ji aliyê kalîte û şêwazê pêşkêşkirinê ve; divê qadeke zêde ji aliyekî re neyê dayîn li ser hesabê piştguhkirina aliyê din.
- Dayîna mafê bersivdayîn û rastkirinê dema ku tomet yan îdiayên ku bandorê li rûmeta kes û aliyan dikin.
- Di dema romalkirina nûçeyên pevçûn, lihevketinên civakî yan dozên nakok ên di navbera komên cuda yên Sûriyeyê de,

misogerkirina hevsengiyê û pêşkêşkirina agahiyan bi şêwazekî ku girjî û aloziyê kêm dike, piştgiriya aramî û nêzîkbûnê dike, ne ku handan û tundiyê xurt dike.

**Duyem: Bêalîbûn û Veqetandina Nêrînê ji Nûçeyê:**

Bêalîbûn di xebata rojnamevaniyê de prensîbeke cewherî ye û xwe dispêre veqetandina zelal a di navbera rastiyên sabit û nêrîn/şiroveyan de. Diyarkirina nasnameya naverokê —ka nûçe ye yan nêrîn e— yek ji hîmên herî giring ên şefafiyeta pîşeyî ye.

Têkelkirina nûçe û nêrînê, baweriya bi medyayê kêm dike û saziyê vediguhere platformeke propagandê; her wiha bi rêya pêşkêşkirina helwestên kesane wekî agahiyên babetyane, dibe sedema xapandina cemawer. Cudakirina zelal a di navbera nûçe, analîz û nêrînê de, mafê cemawer ê gihîştina agahiyên rast diparêze û paqijiya karê rojnamevaniyê mîsoger dike.

Bêalîbûn û veqetandina nêrînê ji nûçeyê, daxwaz dike ku materyalên propagandê û reklaman (bi mebesta qezenc yan piştgiriya siyasî) bi rengekî gumanbar neyin bikaranîn.

**Li ser vê bingehê, îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:**

- Nebe helwestên kesane di nav materyalên nûçeyan de werin derbaskirin û nebe nêrînên rojnamevan yan saziyê di bin navê "çavkaniyan" de werin veşartin.

- Di rewşa têkelbûna nûçe û nêrînê de, divê ev yek bi awayekî zelal were aşkerekirin û materyal were rastkirin, ku "şaşiyeke pîşeyî" çê bûye.
- Darêştina nûçeyan bi zimanekî babetyane, dûrî nêrînên pêşwext, alîgirî yan şiroveyên nirxandinê.
- Veqetandina zelal û aşkere ya di navbera rastiyên hatine piştrastkirin û nêrîn, analîz yan şiroveyan; her wiha diyarkirina cewherê naverokê ji aliyê darîştin, dabeşkirin, sernav û cihê weşanê ve. Ev yek van xalan daxwaz dike:
    1. Heke materyalê nûçeyê şirove yan analîzekê dihewîne, divê bi hevokên wekî "li gorî analîst/pisporan" bi zelalî were diyarkirin; her wiha çêtir e ku materyalên analîz û nûçeyan ji hev cuda bin.
    2. Saziyên medyayê pabend dibin bi lêpirsîna wan rojnamevanên ku nûçe û nêrînê tevlî hev dikin, her wiha pêwîst e siyasetên edîtoriyên yên zelal û nivîskî amade bikin, da ku rêbazên jihevcudakirina nûçe û nêrînan diyar bikin.
- Bikaranîna sernavên wesfî û bêalî ji bo nûçeyan, ku cewherê bûyerê bêyî şirove yan nêrînan nîşan didin. Lê sernavên nêrînan dikarin analîtîk yan rexneyî bin, bi şertekî ku di qalibê xwe de bi zelalî ji nûçeyê cuda bin.
- Dûrketin ji cihdayîna nêrînên kesane, helwestên siyasî/îdeolojîk yan sifetên nirxandinê di nav materyalên nûçeyan de.
- Nabe nêrîn yan texmîn wekî rastî yan agahiyên babetyane, bên pêşkêşkirin.

- Qedexekirina bikaranîna nûçe yan raporên nûçeyî wekî amûreke propagandê (rasterast yan nerasterast) ji bo ti alî, helwest yan arasteyekê.
- Pejirandina tedbîrên editorî û dîtbarî yên ku rê didin cemawer da ku bi zelalî cudahiyê bixe navbera nûçe û nêrînê (yan analîzê).
- Her cure têkelkirina di navbera nûçe û nêrînê de divê bibe mijara nirxandin, rastkirin û lêpirsîna pîşeyî ya navxweyî, da ku baweriya cemawer û pêbaweriya medyayê were parastin.
- Cudakirina zelal a di navbera reklam, sponsorî û propagandê ji aliyekî ve, û naveroka rojnamevaniyê ji aliyê din ve. Nabe berhem, siyaset yan aliyên fînansekar wekî materyalên nûçeyan werin pêşkêşkirin.
- Nîşandana reklaman di qalibên bi temamî cuda de (ji aliyê cih, reng, tîpên nivîsê û dîzayna giştî ve) ji materyalên rojnamevaniyê.
- Weşandina reklaman di şiklê nûçeyan de qedexe ye; ev yek tenê bi nîşaneyeke aşkere ya wekî "Reklam", "Naveroka bi pere" yan her hevokeke din a guman tê de tune be.
- Her hewildanek ji bo veşartina reklaman yan derbaskirina wan wekî nûçe, wekî kiryareke xapînok û binpêkirineke exlaqî ya giran tê hejmartin.
- Rêgirtina li ber sponsor û reklamkeran ku destwerdanê di naverokê yan siyasetên edîtoriyê de bikin; misogerkirina serbixwebûna biryara rojnamevaniyê.
- Qedexekirina peyamên reklamî yên nerasterast di nav naveroka medyayê de; her wiha veqetandina nûçeyan ji bo kompanyayan yan aliyên bazirganî di berdêla berjewendiyên madî yan manewî de, qedexe ye.

- Hilbijartina goşeyên wênegirtinê di weşanên zindî yan vîdyoyan de bi rengekî ku nîşandana tabelayên reklamî yan materyalên propagandê yên ne bimebest neyin xuyakirin.
- Dûrketin ji weşandina reklamên xapînok, derewîn yan jî ji wan reklamên ku mezin-nîşandanê wan, zirarê digihîne raya giştî û dibin sedema xapandina wan.
- Nabe peyamên siyasî di nav naveroka medyayê de werin derbaskirin, yan propaganda ji bo partiyekê li ser hesabê partiyeke din bê kirin. Dema qebûlkirina reklamên siyasî, divê armanc, aliyê fînansekar û aliyê ku sûdê jê werdigire bi zelalî werin aşkerekirin.
- Rojnamevan pabend dibin ku post û platformên xwe ji bo reklaman bi kar neynin, heta ku her tiştî bi şefafî diyar nekin. Pêwîst e bi aşkereyî bê gotin ku ew naverok reklam e yan jî propagandeya bi pere ye.

**Sêyem: Hûrbînî:**

Divê saziyên medyayê pabend bin ku di her materyalekî rojnamevaniyê de asta herî bilind a hûrbînî û zelaliyê mîsoger bikin; dûrî mezin-nîşandanê (mubalexe), derew û gumanan bin. Ev yek di warê ziman, wêne, agahî, hejmar, dîrok, dane û çavkaniyan de derbasdar e.
Ji bo pêkanîna vê armancê, divê ev xal werin cîbicîkirin:

- Piştbestin bi çavkaniyên pêbawer; berî weşandinê divê bi zêdetirî çavkaniyekê re peywendî were kirin, da ku rastiya agahiyê were piştrastkirin.

- Kontrolkirina hûr a agahiyên ku ji peyamnêrên meydanî tên; nexasim agahiyên derbarê hejmara qurbaniyan, asta zirarê û aliyên berpirsyar, da ku rastbûna hejmar û daneyan were parastin.
- Di dema wergerandina ji zimanên biyanî de, divê rastbûn û duristî were parastin. Divê ji wergera peyv-bi-peyv (ya ku wateyê têk dibe yan diguherîne) were dûrketin û li ser bingeha têgihîştina rast a çarçoveyê û termên resen were wergerandin.
- Diyarkirina navên rastîn ên kes û aliyên ku agahî jê hatine girtin. Bikaranîna navên kod (nasnav) tenê di rewşên neçarî yên pîşeyî yan ewlehiyê de gengaz e.
- Di dema weşandina nûçeyên hestiyar ên ku dibe bibin sedema tirs û tevliheviyê (wekî nûçeyên karesat, derketina nexweşiyan û şeran), divê mirov bi baldarî tevbigere û tenê xwe bispêre çavkaniyên fermî û pispor.
- Piştrastbûna ji wêneyên li gel nûçeyan; divê were mîsogerkirin ku wêne rast in û bi mijarê re têkildar in. Her wiha divê dîroka kişandinê û çavkaniya wêneyê were diyarkirin, û cudahî were xistin di navbera wêneyên rastîn, yên temsîlî û yên arşîvê de.

**Çarem: Dûrketin ji Heyecan Medyayî (Sensasyonelîzm):**

Bikaranîna zêdegotinê yan xapandina bi zanebûn ji bo balkişandina cemawer û zêdekirina dîtinan li ser hesabê rastbûn, kûrayî û pêbaweriyê, li dijî hemû rêzikname û etîka pîşeyî ye. Ev yek medyayê ji cewherê wê (ku amûra zanîn û hişmendiyê ye) derdixe û wê vediguhere amûreke qezenc û marketingê. Ev reftar baweriyê lawaz dike, rastiyan bi aliyekî din ve dide, tevliheviyê di nav peyamên medyayê de diafirîne û tovê tirs û derewan di nav civakê de diçîne.

**Nîşaneyên heyecana naxwastî di medyayê de:**

- Bikaranîna sernavên şokdar, yan zêdekirî, yan kişandina daxwaz û hestên cemawer di sernavan de, lê bi naveroka nûçeyê re ne li hev in.
- Girîngîdayîna bi dîmenên tundiyê û dubarekirina dîmenên şokdar (bêyî hinceteke pîşeyî), tenê ji bo tirsandin yan zêdekirina dîtinan.
- Bikaranîna çîrokên mirovî tenê ji bo arandina hest û danûstandinan, bêyî ku giringî bi çareserî yan çarçoveya mijarê were dayîn.
- Girîngîdayîna bi skandal û jiyana taybet a kesayetên giştî, dema ku ti pêwendiya wan bi berjewendiya civakê re tune be.
- Mezin-nîşandana bûyer, karesat yan nexweşiyan bi rengekî zêde.
- Bikaranîna hevokên ku bêyî delîl tirs û sawê belav dikin; wekî: "Sûriye ber bi kendalê ve diçe", "Metirsiyek mezin li ser hebûna Sûriyan heye" û hwd.
- Parvekirina wêne yan vîdyoyên şokdar ên ku sivkayetiyê bi ol, kes yan komên civakî dikin, nexasim li ser torên civakî ji bo komkirina şopîneran.
- Mezin-nîşandana bûyeran ji bo armancên siyasî, aborî yan berjewendiyên kesane.

**Pêncem: Li Berçavgirtina Çarçoveyê:**

Ev tê wateya girêdana mentiqî ya di navbera bûyer û rastiya wê ya kamil de, bêyî ku nûçe ji mercên xwe were jêkirin yan were îzolekirin. Ev yek daxwaz dike ku çarçoveyên siyasî, aborî, civakî, çandî û ewlehiyê yên li dora bûyerê werin fêmkirin. Her wiha divê sedemên berê û encamên

paşê werin nirxandin, da ku nûçe di hundirê wêneya xwe ya giştî de (ne tenê beşek) bigihîje cemawer û têgihîştineke kûr bide wan.

**Mercên li berçavgirtina çarçoveyê:**

- **Komkirina rastiyan di hundirê çarçoveya wan a tam de:** Tenê diyarkirina hêmanên bûyerê (Kî, çi, li kû, kengî û çima) têrê nake; divê sedem, encam û bandorên wê yên gengaz jî werin fêmkirin.
- **Girêdana îro bi raborî û paşerojê ve:** Derxistina pêş a wan faktorên ku bûne sedema rûdana bûyerê û encamên ku dibe di paşerojê de derkevin, da ku wêneyekî demî yê kamil were pêşkêşkirin.
- **Li berçavgirtina rehendên piralî:** Ravekirina bûyerê di nav çarçoveyên wê yên siyasî, aborî, civakî û çandî de, ligel rehendên têkildarî ewlehî û silametiyê.

**Şeşem: Parastina Çavkaniyan:**

Îmzeker pabend dibin ku hemû tedbîrên pêwîst ji bo parastina çavkaniyên agahiyan li hemberî her encameke neyênî yan nebabetyane bigirin, ku dibe ji ber beşdariya wan a di amadekirin yan weşandina naverokê de derkeve, bêyî ku zirar bigihe rastbûna materyalê yan cemawer ji agahiyên bingehîn bêpar bimîne.

Piştbestin bi çavkaniyên pêbawer, piştrastbûn ji agahiyên ku ew didin, fêmkirina sedemên (motîvên) wan û pêşkêşkirina wan bi şefafî û zelalî ji cemawer re, beşeke bingehîn a berpirsyariya exlaqî ya karê rojnamevaniyê ye.

Prensîpa parastina çavkaniyan û pabendbûna pîşeyî bi wan ve, bi van rêyên li jêr pêk tê:

**1. Bikaranîna çavkaniyan bi dîsîplîn:**

- Dûrketin ji bijartinê, yan bikaranîna çavkaniyan bêyî pîvaneke zelal, yan jî veşartina paşxaneyên wan.
- Mezin-nîşandana pêgeh yan şiyanên çavkaniyê bi sifetên ku ew ne hêjayî wan e; piştrastbûn ji pisporî û rastbûna agahiyên ku ew dide.
- Di dozên nakok de, nabe pişt bi tenê bi çavkaniyekê were bestin; divê piralîbûn û berfirehiya çavkaniyan were mîsogerkirin.

**2. Piştrastbûn ji rastiya çavkaniyê û nêzîkbûna wê ji bûyerê:**

- Piştrastbûn ji pêwendiya çavkaniyê bi bûyerê re, asta agahdarbûna wê, paşxane, mebest û pêgeha wê.
- Belgekirina agahiyan û girêdana wan bi çavkaniyan re; ronîkirina têkiliya her çavkaniyekê bi wan daneyên ku pêşkêş dike.

**3. Şefafiyeta di spartina ji çavkaniyan re:**

- Dûrketin ji hevokên gelemper ên mîna "çavkaniyên agahdar" yan "şahidan gotin" bêyî hinceteke pîşeyî.
- Avakirina hevsengiyê di navbera çavkaniyên fermî, serbixwe û yên meydanî de.
- Dema ku nîqaşek hebe, divê derfet ji bo çavkaniyên ku temsîla hemû nêrînan dikin were dayîn.
- Veneguhestina daxuyanî yan daneyên ji aliyên nepispor, yan yên ku armancên wan ne diyar in.

**4. Diyarkirina pêwendiya çavkaniyê bi mijarê re:**

- Divê di dema nîşandana çavkaniyê de, têkiliya wê bi dozê re were zelalkirin.

- Heke veşartina nasnameya çavkaniyê neçarî be, divê sedema wê ji cemawer re were xuyakirin.
- Heke gihîştina çavkaniyên têrker ne gengaz be, divê sedem werin diyarkirin.

**5. Serbixwebûna ji ajandeyên çavkaniyan:**

- Redkirina hewildanên çavkaniyan ên ji bo ferzkirina ajandeya xwe, yan kontrolkirina herikîna materyalê û jêbirina hin beşan ji wê.
- Nepejirandina ziman, têgeh yan ajandeya çavkaniyê.
- Qebûlkirina berpirsyariyê di rewşa rûdana xapandin yan şaşiyekê ku ji ber spartina bi çavkaniyekê çêbûye.

**6. Hevsengiya di bikaranîna çavkaniyan de:**

- Dûrketin ji mezin-nîşandana çavkaniyeke diyarkirî.
- Dayîna derfetê ji bo çavkaniyên gelêrî û sivîl di dozên giştî de, li şûna ku mirov tenê xwe bispêre aliyên fermî.

**7. Rastbûn di wergirtina gotinên çavkaniyan de:**

- Piştrastbûn ku di dema kurtkirin yan wergirtina beşekê ji daxuyaniya çavkaniyê de, wate neguherî ye.
- Bikaranîna durist a nîşanên xalbendiyê, di dema pêşkêşkirina daxuyanî û gotinan de.

**8. Serederiya bi platformên dîjîtal re wekî çavkanî:**

- Kontrolkirina dîroka avakirina platformê, kalîteya weşanên wê, rêveberên wê û çarçoveya danûstandina bi wê re.
- Divê platformên dîjîtal ên nenas wekî çavkaniya sereke neyên dîtin; ew tenê wekî çavkaniya duyemîn dikare were bikaranîn, ew jî piştî piştrastbûn ji pêbaweriya wan piştras bibe.

**9. Nehênî û parastina çavkaniyan:**

- Pabendbûn bi aşkerenekirina agahiyên kesane yan razên (sir) ku rojnamevan bi rêya baweriyê ew bidest xistine.
- Nasnameya çavkaniyekê ku li ser parastina wê lihevkirin hatiye kirin aşkere neke; ji bilî van rewşên taybet:
    - Hebûna daxuyaniyeke qanûnî ya zelal.
    - Hebûna metirsiyeke mezin li ser jiyana kesên din.
    - Daxwaza fermî ya ji aliyê saziyeke dadwerî ya serbixwe ve.
    - Daxwazeke pîşeyî ya rewa li gorî pîvanên zelal.

**10.** Pabendbûna saziyan bi danîna siyasetên nivîskî ji bo birêvebirina agahiyan, bikaranîna amûrên parastinê û diyarkirina mekanîzmayên danûstandina bi rayedaran re, dema ku daxwaza daneyan dikin.

**11. Bidestxistina agahiyan bi rêyên pîşeyî:**

- Dûrketin ji rêbazên nepîşeyî ji bo komkirina agahiyan. Ev tenê di rewşên pir awarte de, wekî aşkerekirina gendeliyê yan lêkolînên lêgerînî gengaz e, bi van mercan:
    - Hebûna berjewendiyek giştî ya zelal.
    - Îsbatkirina ku bi ti rêyên din bidestxistina agahiyan ne gengaz e.
    - Wergeritina razîbûna nivîskî ji sê aliyên îdarî yên di nav saziyê de.
    - Pabendbûn bi kêmkirina zirara gengaz a li ser çavkaniyê.

**12. Bikaranîna kesan wekî çavkanî:**
Divê mirovên asayî wekî çavkanî neyên bikaranîn, heya ku ew bi temamî

li ser cewherê karê rojnamevan, cihê weşandinê û wan zererên ku dibe ku bigihêjin wan, neyên agahdarkirin.

**13. Danûstandina dadperwer bi hemû çavkaniyan re:**

- Divê serederî bi her çavkaniyekê re bi dadmendî were kirin, her çend ew çavkanî gumanbar be, yan di bin lêpirsîn û dadgehkirinê de be jî.
- Pabendbûn bi parastina çavkaniyan ji her encameke neyênî ya nebabetyane, ku dibe ji beşdariya wan a di amadekirin yan weşandina materyalê de derbikeve; bêyî ku zirar bigihe rastbûna nûçeyê yan mafê raya giştî ê gihîştina agahiyan.

**Heftem: Destpakî:**

Destpakî tê wê wateyê ku rojnamevan pabendî veguhastina agahî, nêrîn û daxuyaniyan a bi dilsozî û hûrbînî be; bêyî ku alîgiriyê bike, meyldariyê nîşan bide yan jî agahiyan ji çarçoveya wan derxîne. Her wiha, divê rojnamevan her cure pêşniyar, serpişkêtiyên madî û manewî yan berjewendiyên kesane (darayî, siyasî, manewî) red bike ku ji aliyê aliyên derve ve (çi kes, sazî, şirket an jî kom bin) bi mebesta bandorkirina li ser naveroka rojnamegeriyê, yan jî ji bo arastekirina romalkirina medyayî ya bi awayekî nebabetyane tên pêşkêşkirin."

**Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:**

- Qebûlnekirina diyarî, komîsyon yan qezencên madî û manewî ji ti aliyekî ku di romalkirinê de xwedî berjewendî be; her wiha dûrketin ji her danûstandinekê ku dibe bibe sedema ladana rastiyan, meyldarî yan alîgiriya ji bo berjewendiya aliyekî.

- Nekirina propagandaya rasterast yan nerasterast bo aliyên sûdwergirtî di nav naverok û rûmalkirinên medyayî de, ku ji ber berjewendiyên kesane yan sazûmanî çêdibin.
- Dûrketin ji her romalkirineke alîgir. Divê rê neyê dayîn ku berjewendiyên kesane yan darayî arasteya naveroka rûmalkirinê bikin yan jî rêza pêşîntiyên weşanê diyar bikin.
- Qedexekirina bikaranîna pêgeh, nasname yan bandora medyayê ji bo bidestxistina qezencên kesane yan qezencên nerewa (madî û manewî); her wiha nabe xizmetkirina berjewendiyên derveyî li ser hesabê berjewendiya giştî yan rastiyê, were kirin.
- Pabendbûn bi rêgirtina li ber her aliyekî hundirîn yan derveyî ku bixwaze bandorê li ser naveroka edîtoriyê bike, da ku destpakî, babetbûn û serbixwebûn were misogerkirin.
- Qedexekirina pêşkêşkirina rapor, nûçe yan materyalên medyayê bi mebesta xizmetkirina berjewendiyên kesane, yan kompanyayan bêyî hinceteke pîşeyî û babetyane.
- Pêgeha pîşeyî nabe were bikaranîn, ji bo tolhildan, navzirkirin yan bidestxistina qezencên taybet ji bo rojnamevan, xizmên wî yan aliyên têkildarî wî.
- Redkirina her erkekîê ku li dijî rêzikên pîşeyî be, yan prensîpên vê belgenameyê binpê bike.
- Aşkerekirina her nakokiyeke berjewendiyan ya gengaz ku dibe bandorê li ser babetbûn û rastbûnê bike; her wiha beşdarnebûna di romalkirina li ser aliyên ku têkiliya rojnamevan bi wan re heye, da ku bêalîbûn winda nebe.
- Saziyên medyayê pabend dibin ku siyasetên zelal ji bo rêgirtina li nakokiya berjewendiyan deynin û serbixwebûna rojnamevanan misoger bikin.

- Pabendbûna tund bi mafên weşanê û milkiyeta ramanî. Divê materyalên hatine veguhastin bi awayekî hûr werin belgekirin û li ser navê çavkaniya wan a resen werin tomarkirin..
- Îmzeker pabend dibin ku têkilî yan endamtiya xwe ya di saziyên siyasî, aborî yan kompanyayên têkiliyên giştî (PR) de aşkere bikin û her tiştê ku dibe bandorê li serbixwebûna karê wan bike, diyar bikin.

**Rewşên taybet ên ku destpakiyê têk didin:**
Hinek reftarên din hene ku dikarin prensîpa destpakiyê hilweşînin û pêbaweriya medyayê lawaz bikin; divê saziyên Sûriyeyê û xebatkarên wan bi temamî ji wan dûr bikevin:

1. Qebûlkirina diyarî, xelat yan komîsyonan ji aliyên xwedî berjewendî di berdêla romalkiron yan erkên rojnamevaniyê de, ji bilî diyariyên sembolîk ên asayî yên ku bi piranî ji mêvanan re têne dayîn.
2. Dayîna bertîl, diyarî yan sozên qezencê bi awayekî rasterast yan nerasterast ji bo çavkaniyan (çi ji aliyê rojnamevanan çi ji aliyê saziyên wan ve be), ji bo agahiyan werbigirin, hevpeyvînan tomar bikin yan romalekê temam bikin.
3. Hebûna pişkên rojnamevan yan xizmên wî di kompanyaya ku nûçe li ser tê çêkirin de, yan jî hebûna girêdaneke siyasî ku bandorê li şêwazê romalkirinê bike.

**Heştem: Şefafiyet (Zelalî):**

Şefafiyet di vegerandin û avakirina baweriya di navbera raya giştî û xebatkarên sektora medyayê de, roleke bingehîn dilîze. Ew bi awayekî çalak rê li ber destwerdana di naverokê de digire, prensîpa lêpirsîna xweser xurt dike û rojnamevanan ji aliyê pîşeyî û yasayê diparêze. Şefafiyet gumanan ji ser rojnamevan û naveroka wî dûr dixe, navûdengekî baş dide xebata wî û baweriya çavkaniyan pê xurt dike. Her wiha, şefafiyet û zelaliya pîvanên ku rojnamevan dişopîne, alîkariya wî dike da ku li hemberî zextên derveyî li ber xwe bide.

Saziyên medyayê ji bo peydakirina fînansekirinê û avakirina navûdengê xwe, ku sermayeya wan a herî giring e, pêdivî bi şefafiyetê heye. Ev yek dilsozî û baweriya raya giştî zêde dike, û dihêle ku raya giştî saziyê wekî ya xwe bibîne, di krîzan de biparêze û heta şaşiyên wê jî qebûl bike. Şefafiyet alîkariya saziyan dike ku rîsk û qeyranan birêve bibin û rêveberiya navxweyî baştir bikin.

**Îmzeker pabendî van xalên li jêr dibin:**

1. Aşkerekirina çavkaniyan dema ku ti metirsî li ser jiyana wan tune be; her wiha diyarkirina sînorê şiyan, zanîn û agahiyên ku ji wan hatine girtin.
2. Şirovekirin û ronîkirina rêbazên xebatê û mekanîzmayên piştrastkirinê; her wiha weşandina rêzikname, siyasetê edîtoriyê, agahiyên li ser xwediyên saziyê û asta yekem a rêveberiyê.
3. Aşkerekirina her berjewendiyek kesane ya rêveberiyê yan saziyê ku dibe bandorê li ser naveroka weşandî bike.
4. Naskirina şaşiyan û diyarkirina rêyên rastkirina wan.

5. Amadekirina kanalan ji bo gilî û gazincên cemawer û têkiliya bi sazî û kesan re; her wiha zelalkirina şêwaz û dema bersivdayînê.
6. Îmzeker pabend dibin ku gava çavkanî nexwazin agahiyên têkildarî berjewendiya giştî aşkere bikin yan wan veşêrin, heke ev yek zirarê digihîne berjewendiya giştî, vê rewşê ji raya giştî re ragihînin; ev yek li gorî prensîpa şefafiyetê û parastina mafê raya giştî yê zanînê ye.
7. Şefafiyet di çavkaniyên piştgirî û fînansekirinê de; aşkerekirina hemû çavkaniyên darayî (çi hundirîn çi derveyî) yên ku kes yan sazî bidest dixe. Ev yek rê dide raya giştî û aliyên peywendîdar ku asta destpakî û serbixwebûna biryarên saziyê binirxînin. Armanc ew e ku bawerî û pêbawerî xurt bibe û rê li ber nakokiya berjewendiyan yan gumanên li ser bikaranîna pereyan were girtin.

**Ji bo pêkanîna vê yekê, divê ev xal werin cîbicîkirin:**

- Ragihandina zelal a nasnameya fînansekar (kes, sazî, hikûmet yan kompanî bin).
- Diyarkirina nirxê fînansekirinê û çavkaniya wê, çi herêmî yan navdewletî be û cewherê wê.
- Ronîkirina her şert yan qeydên ku bi fînansekirinê ve girêdayî ye, da ku ti bandor li ser serbixwebûna naverokê neyê kirin.
- Dabînkirina gihîştina hêsan a raya gistî ji bo agahiyên têkildarî fînansekirinê.
- Pabendbûna tam bi yasa û sîstemên taybet bi reklamên bazirganî di medya û torên civakî de, nexasim gava kar bi mebesta qezencê be.

**7- Ragihandin û xebatkarên wê pabend dibin ku her fînansekirina ku bandorê li ser xeta edîtoriyê yan arastekirina naverokê dike, red bikin.**

**Qebûlkirina van xalên li jêr qedexe ye:**

- Fînansekirina bi şert a ku azadiya naverokê sînordar dike yan romalê di xizmeta fînansekar de bi kar tîne.
- Fînansekirina nenas yan ya ku bi şefafî nehatiye ragihandin.
- Fînansekirina ku bi karên neyasayî yan neexlaqî ve girêdayî ye, yan jî armanca wê têkbirina aştiya navxweyî, zêdekirina tevliheviyê û têkbirina baweriya di navbera pêkhateyên civakê de ye.
- Fînansekirina ji aliyê hêzên siyasî ve ku dixwazin medyayê ji bo bandorkirina li ser raya giştî û ajandeyên taybet bikar bînin.
- Reklam yan sponsoriyên ku armanca wan guhertina xeta pîşeyî yan xapandina raya giştî ye.
- Her fînansekirina ku nakokiya berjewendiyan diafirîne yan serbixwebûna biryara medyayê dixe metirsiyê.

**Nehem: Rastkirin û Lêpirsîn:**

- **Misogerkirina mafê bersivdayîn û rastkirinê:**
  **Mafê Bersivdayînê:** Mafê kes û saziyan e ku bersivê bidin daxuyanî yan agahiyên ku li ser wan di medyayê de hatine weşandin, û derfeta nîşandana helwesta wan ji bo wan were dayîn.
  **Mafê Rastkirinê:** Mafê kes yan aliyekî ye ku her agahiyeke şaş yan nedurist a ku li ser wan hatiye weşandin, di medyayê de bide rastkirin, da ku navûdengî û mafên wan were parastin.

Bersivdayîn û rastkirin mafekî bingehîn e ku dihêle mirov li hemberî agahiyên kêm yan xapînok xwe biparêze. Rêzgirtina li vê mafî, beşeke cewherî ji berpirsyariya medyayê ya ji bo xurtkirina şefafiyet û pêbaweriyê ye.

- **Şêwazên pêkanîna mafê bersivdayîn û rastkirinê:**
  Ev maf bi rêya van amûr û mekanîzmayan pêk tê:

1. **Weşandina daxuyaniyên nivîskî:** Mafê kesê ziyandîtî heye ku daxuyaniyeke nivîskî ya bersivdayînê pêşkêş bike û divê sazî di qadeke guncayî de bi dadperwerî biweşîne.
2. **Hevpeyvîn:** Sazî dikare hevpeyvînekê bi kesê têkildar re bike, da ku nêrîn û helwesta wî bi rengekî hevseng were xuyakirin.
3. **Têkiliya rasterast:** Sazî bixwe têkiliyê bi kes yan aliyê tometbarkirî re deyne, da ku bersiva wan di nav naverokê de bi cih bike.
4. **Xurtkirina kanalên têkiliyê:** Sazî divê danûstandina bi raya giştî re xurt bikin, da ku agahî û bersiv bi rêyên şefaf werin wergirtin û baweriyeke domdar ava bibe.

**Li ser vê bingehê, îmzeker pabendî van xalan dibin:**

- Naskirina aşkere û bi dilêrî ya şaşiyan û rastkirina wan a bilez; divê ji veşartin yan lîstina li ser şaşiyan were dûrketin. Pêwîst e rastkirin çend caran û bi zelalî were weşandin.
- Pejirandina siyasetê rastkirinê yên nivîskî ku pîvan û cureyên şaşiyan zelal dikin; li gel diyarkirina mîkanîzmayên çavdêriya hundirîn û edîtoriyê bo wan materyalên ku gilî li ser hene. Her wiha avakirina sîstemeke gilî û gazinan yan beşdarbûna di platformên ku rê didin raya giştî nêrîn û têbîniyên xwe bide.

- Danûstandina cidî bi giliyan re; dûrketin ji destkarîkirina şêwazê rastkirinê; divê qebûlkirina şaşiyê, lixwegirtina berpirsiyariyê ya bi awayekî aşkere di nav xwe de bihewîne.
- Têkiliya exlaqî bi rexneyên pîşeyî re; serlêdana diyalog û peywendiya rasterast bo çareserkirina nakokiyên ku ji ber naveroka weşandî derketine.
- Weşandina raporên salane ku hejmara giliyan, cewherê wan û rêbazên çareserkirina wan zelal dikin, bi mebesta xurtkirina prensîpa şefafiyetê û avakirina baweriyê bi raya giştî re.
- Weşandina siyasetên edîtoriyê, rêziknameyên reftarê, nirxên saziyê, agahiyên xwedîtiyê û çavkaniyên fînansekirinê, sponsorên naverokê û desteyên rêveberiyê, da ku raya giştî ji çarçoveya karê pîşeyî agahdar be.

**Dehem: Mafên Milkiyeta Ramanî**

Rêzgirtina li mafên weşanê, mafên ramanî û mafê nivîskaran, erkê bingehîn e ku dikeve ser milê saziyên medyayî û rojnamevanan. Ev yek di parastina afirîneriyê û çespandina baweriya pîşeyî de beşeke cewherî ye; her wiha saziyan ji metirsiyên darizandina yasayî diparêze.

Xwediyê mafê milkiyeta ramanî, ew kes yan saziya ku naverokeke resen (orîjînal) berhem aniye û xebateke berbiçav jê re kiriye, tê hejmartin. Ev naverok dikarin bi rêya her amûrekê werin weşandin, wek: nûçeyên nivîskî, bihîstî û dîtbarî, wêne, dîzayn, fîlmên belgeyî û tomarên dengî. Ev berhem bi giştî li gorî yasayên mafê nivîskar û weşanê parastî ne.

Li gorî yasayên "bikaranîna dadmendane", mirov dikare beşek ji materyalên rojnamegeriyê ji bo mebestên wekî rexne, analîz, şîrove, perwerde yan lêkolînê dubare bikar bîne, bêyî ku wekî binpêkirina mafê nivîskar were dîtin; bi şertê ku ev bikaranîn bi dadmandî be û li gorî

pîvanên yasayî be. Tevî vê yekê jî, her tim çêtir e ku dema materyalek bi temamî yan bi beşekî tê bikaranîn, destûra pêşwext ji xwediyê naveroka resen were girtin.

**Li ser vê bingehê, îmzekar pabendî van xalên jêrîn dibin:**

- Binpênekirina yasa û rêzikên parastina mafên weşanê; dûrketin ji weşandin yan parçekirina (jêgirtina) her naverokeke ku berê hatiye weşandin, bêyî pabendbûn bi mafên milkiyeta ramanî yên ku di yasa û rênimayên reftarê yên navdewletî de hatine diyarkirin.
- Diyarkirina xwediyên resen, di dema jêgirtin yan bikaranîna naverokekê di materyalên nû de, divê ew naverok yan beşê naverokê bi awayekî zelal û aşkere li ser navê xwediyên wan ên resen were tomarkirin.
- Dûrketin ji destkarîkirina naveroka weşandî, guhertina çarçoveya wê yan guhertina wateya wê bi awayekî ku ziyanê bigihîne xwediyê berhemê yan raya giştî bixapîne.
- Zelalkirina têgeha "Hevparên Afirîner" û moletên wê bo saziyên medyayî; ravekirina şêwazên bikaranînê û mafên parastî yên pê ve girêdayî, da ku bikaranîna yasayî û rast a naverokên bin van moletan were mîsogerkirin.
- Belgekirina hemû materyalên ku di lêkolîn û raporan de têne bikaranîn bi çavkaniyên hûr û zelal, da ku rê bide raya giştî ku rastiya çavkaniyên agahiyan kontrol bike.
- Perwerdekirina kadroyên medyayî li ser yasayên navxweyî û navdewletî yên weşan û jêgirtinê; da ku şarezabûnê di naskirina maf û erkên pîşeyî yên têkildarî bikaranîna naverokên weşandî de werbigirin.
- Ji rojnamevan re qedexe ye ku agahî, wêne yan materyalên ku berê di dezgeheke din de hatine weşandin, li ser navê xwe nîşan bide; wekî parçeyek ji şefafiyeta pîşeyî, divê navê çavkaniyê were diyarkirin.

- Saziyên medyayî yên ku bi ajansên nûçeyan yan platformên derve re kar dikin, pabend in ku peymanên zelal îmze bikin, da ku mafên bikaranîn û weşanê diyar bikin û silametiya karê pîşeyî biparêzin.
- Qedexebûna dubare weşandin yan jêgirtina her naverokeke nivîskî, dîtbarî, bihîstî, yan jî ramanî, lêkolîn, agahî û hejmarên ku berhema kesên din in, bêyî ku bi awayekî hûr navê xwediyên wan yan çavkaniyên wan were gotin. Her wiha divê cudahî di navbera jêgirtina herfî (quote) û kurteyên analîzî de were kirin.
- Dûrketin ji dubare berhemanîna naverokekê ku berê hatiye weşandin (çi ya heman kesî be, çi ya heman saziyê be) û nîşandana wê wekî naverokeke nû.
- Qedexebûna wergerandina materyalan ji zimanên din û pêşkêşkirina wan wekî berhemeke resen a nû, bêyî ku navê çavkaniya sereke were diyarkirin.

**Madeya Şeşem: Bikaranîna Medyaya Civakî**

Ev made li ser hemû materyalên ku tên weşandin yan tên parvekirin, her wiha li ser şirove û peyamên di nav torên medyaya civakî de (di nav hemû hesabên kesên îmzekar de) derbasdar e.

Hemû xalên berê yên vê rêziknameyê, ji bo her cure çalakiya dîjîtal wekî bingehekê tên qebûlkirin. Weşandina li ser platformên fermî yên saziyên medyayî û weşandina li ser hesabên kesane yan pîşeyî yên rojnamevanan, di warê berpirsiyarî û lêpirsînê de, wekî hev tên dîtin. Ev yek ji bo misogerkirina pabendbûna xebatkeran bi pîvanên exlaqî û pîşeyî di hemû qadên medyayî de ye.

Kesên îmzekar xwe ji şaşfêmkirina naverokên qerfî û tenzî diparêzin. Divê naveroka qerfî yan tanazî ewqas zelal bin ku raya giştî tê de tûşî şaşfêmkirinê nebe. Divê were berçavgirtin ku tonê deng û şêwazê qerfî di înternetê de her tim bi drustî nagihîje kesê wergir, lewma divê mirov

ji weşandina her naverokeke ku wekî bêhurmetî yan êrîşkarî were fêmkirin, dûr bikeve.

**Îmzekarên vê rêziknameyê pabendî van xalên jêrîn dibin:**

- Handan yan banga bo tawan û tundûtûjiyê, pesnê tundûtûjiyê yan pesnê tawanbaran di medyaya civakî de qedexe ye.
- Berhemanîn yan belavkirina gotara nefretê, cudakarî, yan ziyangihandina kesên din, li gorî ku di madeyên berê de hatine diyarkirin, qedexe ye.
- Berhemanîn yan dubre weşandina naverokên fêlbazî, xapînok, gotegot yan nûçeyên nepiştrastkirî, her wiha weşandina agahiyên ne-hûr li ser mijarên tenduristî û jiyanî wekî ku rastiyên zanistî û ji aliyê pisporan ve hatibin gotin, qedexe ye.
- Pabendbûn bi nehiştina bêrêziya li hemberî bawerî, çand, dab û nerîtan, çi bi awayekî rasterast be, çi nerasterast be yan jî bi rêya henekpêkirinê be.
- Parvenekirina naverokên ku kes yan koman dixin bin metirsiyê, yan wan rûreş dikin, yan ziyaneke derûnî û civakî digihînin wan; her çend ew naverok di medyaya civakî de pir hatibe belavkirin jî.
- Di dema bikaranîna Zîrekiya Destkird (AI) bo berhemanîn yan guhertina naverokan, divê pabendî xalên vê rêziknameyê bin û ji raya giştî re were diyarkirin ku zîrekiya destkird bi awayekî parçeyî yan tam di berhemanînê de hatiye bikaranîn.
- Dema ku îmzekar hesabên xwe yên kesane bikar tînin, divê baldar bin ku ew bi awayekî rasterast yan nerasterast nûneratiya saziyên xwe dikin. Ji ber vê yekê, berpirsiyar in ku ziyanê negihînin saziya xwe. Di dema weşandinê de, divê were diyarkirin ku nêrîna hatî gotin nûneratiya saziyê nake, bi mercê ku rêz li hemû xalên vê rêziknameyê were girtin.

- Rojnamevan û xebatkarên medyayê pabend in ku propagandaya berjewendiyên siyasî yan aborî nekin, da ku serbixwebûna wan û ya saziya wan nekeve bin gumanê û baweriya raya giştî bi rastbûna naverokê neheje.
- Îmzekar pabend in bi belavkirina hişmendî û nirxên erênî û avakirina civakeke dîjîtal a ewle. Divê ji beşdarbûna di naverokên "trend" ên ku banga nefret û zêdegaviyê dikin dûr bikevin, ji ber ku ew wekî rêberên ramanê û bandorkerên civakê tên dîtin.
- Pabendbûn bi parvenekirina peywendiyên taybet, wêne, vîdyoyên ku bi awayekî taybet hatine şandin yan axaftinên komên girtî, ji bilî rewşên ku xwediyên wan destûrê bidin yan berjewendiyeke giştî ya pir xurt hebe, herwiha hewl bê dayîn ku ziyan di asta herî kêm de be.

**Weşana Zindî û Şirove:**

Îmzekar, nexasim sazî yan nîv-sazî, pabend in ku siyasetên zelal ji bo weşanên zindî, şirove û parvekirinên li ser platforman deynin. Di van siyasetan de divê rêzikên vê rêziknameyê, azadiya ramanê, mafê gihîştina agahiyan, silametiya raya giştî û berpirsiyariya nehiştina veguherandina platforman bo qada handan, reşkirin û xapandinê werin parastin.

**Şirove (koment):**

Îmzekar di van rewşên jêrîn de şiroveyên li ser parvekirinan yan yên di dema weşana zindî de jê dibin yan blok dikin:

- Her tiştê ku bang li kirina tawanan dike, handana çalakiyên neyasayî yan neexlaqî dike, yan jî handana nefret û cudakariyê dihewîne.

- Her tiştê ku agahiyên metirsîdar li ser jiyana kesên din yan li ser tenduristiya wan dihewîne.
- Hemû şiroveyên ku rûreşkirina aşkere dihewînin, yan li ser gotegotên nepêbawer, nûçeyên xapînok, peyvên şermê li dijî rawiştê, yan jî bêrêziya biqestî li dijî kesan yan pêkhateyeke civakî ne.
- Hemû şiroveyên ku nijadperestî, cudakarî, qalibên amade yan gotinên nefretê dihewînin.
- Hemû şiroveyên ku agahiyên kesane bê destûra xwediyên wan, yan lînkên gumanbar dihewînin.

**Weşana Zindî:**

Îmzekar pabendî van xalên jêrîn dibin:

- Redkirina beşdarîkirina wan kesên ku naskirî ne bêrêziyê li kesên din dikin, gotinên nefretê, yan peyvên nexweş û reftarên neexlaqî dikin.
- Pabendbûn bi nexwendina wan şiroveyên ku bêrêziyê dihewînin yan yên ku li dijî rêzikên ku berê hatine ne.
- Destêwerdan bo rawestandina pêlên zêdegaviyê (tenemur), gotinên nefretê yan birîndarkirina rûmetê, çi bi awayekî rasterast be çi jî di nav şiroveyan de be.
- Neguhertina weşanê bo platformeke belavkirina kîn û nefretê, şermezarkirina kesan yan kêmkirina rûmeta wan.
- Mêvan, raya giştî yan beşek ji xelkê nabe bibe mijara zêdegaviyê, kiryarên sivikatiyê yan reftarên metirsîdar bo ser jiyana wan.
- Rawestandina weşanê û parvekirinê, yan jêbirina wê, heke naverok li dijî vê rêziknameyê û paşkoya wê be.

**Ev rêzikname sazî û kesan han dide ji bo:**

- Bersivdayîna pîşeyî bo pirs û rexneyan.
- Nêrîna li şiroveyan û bersivdayîna wan, wek amûreke xurtkirina têkiliya bi xelkê re bibîne.
- Dûrketin ji nîqaşên bi hêrs û neexlaqî.

**Rastkirin û Jêbirin Piştî Weşandinê:**

Şaşiyên li ser medyaya civakî, li gorî prensîpên duristî û şefafiyetê yên di vê rêziknameyê de hatine diyarkirin, tên rastkirin:

- Dema ku di parvekirinekê de (nivîs, wêne, vîdyo) şaşiyeke bingehîn çêbibe, heta ji dest tê divê rastkirin li ser heman parvekirinê were kirin û guhertin di destpêka nivîsê de yan di şiroveyeke sabitkirî de were aşkerkirin.
- Heke parvekirina şaş pir belav bûbe, çêtir e ku parvekirineke serbixwe û nû were kirin ku tê de rastkirin were ravekirin, yan lêborîn were xwestin; di heman demê de divê amaje bi materyala sereke jî were kirin.
- Heke naverokeke xapînok yan biçûkxistinê bandor li raya giştî kiribe, yan zirar gihandibe kes û aliyan, nabe bi tenê bi jêbirinê were beskirin; divê ravekirineke zelal were dayîn.
- Dema parvekirineke şaş were jêbirin, divê li pey wê parvekirineke din were kirin ku tê de sedemên jêbirinê, qebûlkirina şaşiyê û lêborîn hebe.
- Divê naverok berî weşandinê bê kontrolkirin, daku li gorî rêziknameyê be; bi taybetî di mijarên gotinên nefretê, taybetmendî, parastina komên lawaz û berjewendiya giştî de.

**Parastina Hevsengiyê di Têkiliyên Siyasî de:**

Dibe ku hin gavên rojnamevanan ên ji bo mebestên pîşeyî (wek şopandina hesabên kampanyayên siyasî yan komên berjewendîxwaz), wekî alîgirî werin fêmkirin. Ji bo parastina babetyariyê, divê rojnamevan hesabên aliyên cuda (partî yan aliyên ku xwedî nêrînên dijber in) bişopînin, da ku bikaribin wêneyeke hevseng û giştî derbarê mijarên di rojevê de pêşkêş bikin.

## Madeya Heftem: Zîrekiya Destkird

Ji ber geşedanên bilez ên di teknolojiyên Zîrekiya Destkird (AI) de û berfirehbûna bikaranîna wê di qada medyayê de, amadekirina çarçoveyeke exlaqî ya zelal, dibe pêdiviyeke bingehîn. Ev çarçove mîsoger dike ku ev teknolojî bi berpirsiyarî û di xizmeta berjewendiya giştî de were bikaranîn; her wiha nirxên mirovî û niştimanî diparêze û nahêle ev amûr bibin amraza xapandin, berevajîkirina rastiyan yan binpêkirina mafan.

Mijarên exlaqî yên girêdayî bikaranîna teknolojiyên zîrekiya destkird, di hemû qonaxên berhemanîna naveroka medyayî de amade ne; ji qonaxa lêkolîn û komkirina agahiyan bigire, heta nivîsandina deqan, dîzaynkirina materyalan û qonaxên dawî yên weşandin û belavkirinê. Ji bo xurtkirina prensîpa şefafiyetê û avakirina baweriyê bi raya giştî re, divê rojnamevan û edîtor bi awayekî zelal aşkere bikin ka di kîjan qonaxên karê xwe de, kîjan amûrên zîrekiriya destkird bikar anîne.

Tevî sûdên berfireh ên pergalên zîrekiya destkird, ev teknolojî kêşeyên exlaqî yên mezin jî bi xwe re tîne; wek binpêkirina taybetmeniyê, berhemanîn yan derbaskirina xapandinê, xurtkirina alîgirî û cudakariyê û çespandina qalibên amade. Her wiha, sipartina belavkirina nûçeyan yan çavdêriya naverokê li ser torên civakî û motorên lêgerînê bo

algorîtmayan, dibe bibe sedema pirsgirêkên derbarê azadiya ramanê, rastiya agahiyan, hişmendiya medyayî û mafên kesan de.

Ji ber ku Sûriye welatekî endamê UNESCOyê ye, ew pabendî wê rasperdeya ku di sala 2021an de ji aliyê rêxistinê ve hatiye pejirandin e; ku ev yek yekemîn pîvana cîhanî ye bo exlaqê zîrekiya destkird û her 194 dewletên endam li ser li hev kirine.

Armanca vê rêziknameyê ew e ku çarçoveyeke niştimanî ya giştî û hevaheng bi raspardeyên UNESCOyê re amade bike. Ev çarçove beşdar dibe di birêvebirina sîstema zîrekiya destkird di sektora medyayê de (ji dîzaynkirin û pêşxistinê heta weşandin û bikaranînê). Bi vî awayî berpirsiyariya hevbeş di navbera hikûmet, dezgehên medya û sektora taybet de xurt dibe û sîstemeke medyayî ya nûjen û pêbawer ava dibe ku piştgiriya nûjeniyê dike û baweriya civakê diparêze.

**Pênase:**

Ji bo mebestên vê rêziknameyê, wateya van têgehan wekî li jêr e:

- **Zîrekiya Destkird:**
  Her sîstemeke nermalavê (software) ku xwe dispêre teknolojiyên hînbûna makîneyê, yan algorîtmayan, bi mebesta berhemanînê, guhertin yan analîzkirina naveroka medyayî.
- **Komîte:**
  Komîteya Zîrekiya Destkird e, ku berpirsyara danîna siyasetên rêkûpêk û pejirandina amûr û teknolojiyên di saziyên medyayî de ye.
- **Rêkxer (Koordînator):**
  Rêkxerê exlaqê zîrekiya destkird e, ku erkê wî şopandina pabendbûna bi xalên vê rêziknameyê û çavdêrîkirina cîbicîkirina wan a rojane di nav saziyên medyayî de ye.

- **Binpêkirin:**
  Her bikaranîneke amûrên zîrekiya destkird a ku li dijî xalên vê rêziknameyê yan yasayên niştimanî yên berdest be, yan bibe sedema ziyanên pîşeyî û civakî.
- **Naveroka Destkird:** Her nivîs, wêne, vîdyo yan materyaleke medyayî ya ku bi awayekî parçeyî yan tam bi rêya amûr û pergalên zîrekiya destkird hatiye berhemanîn.

**Prensîpên Giştî:**

Teknolojiyên nûjen, di nav de jî amûrên zîrekiya destkird (AI), wekî amûrên alîkar û lezkerên karê medyayî tên hejmartin; ev amûr ti carî nabin cîgirên tam ên rola mirov. Nabe mirov bi awayekî mutleq bawerî bi berhemên wan bîne, yan xwe bi temamî bispêre wan; ji ber ku berpirsiyariya edîtorî, pîşeyî û exlaqî bi temamî li ser milê rojnamevan û xebatkarên sektora medyayê ye. Ev berpirsiyarî, kontrolkirina naveroka ku bi van teknolojiyan hatiye berhemanîn yan sererastkirin jî di nav xwe de dihewîne, da ku li gorî rênimayên pîşeyî û exlaqî yên vê rêziknameyê be.

**Algorîtma û Çavdêriya Mirovî:**

Divê îmzekar zanibin ku teknolojiyên hişmend dibe ku alîgiriyên ku di algorîtmayên wan de veşartî ne, nîşan bidin; ev yek jî dibe ku bibe sedema neheqî, şaşî yan berevajîkirina naverokê. Ev rewş daxwaza hişyariyeke pîşeyî ya berdewam û nirxandineke rexneyî bo hemû berheman dike.

Li ser vê bingehê, îmzekar pabendî van xalên jêrîn dibin:

1. Her naverokeke ku bi zîrekiya destkird hatiye berhemanîn yan sererastkirin, divê di bin kontroleke mirovî ya hûr û giştî re derbas bibe, da ku silametiya berhemê were parastin û ji şaşî û alîgiriyan pak bibe.
2. Tîmên edîtoriyê ji naveroka dawî ya ku tê weşandin bi temamî berpirsiyar in, bêyî ku li amûrên di dema berhemanînê de hatine bikaranîn were nêrîn.

**Kêşeyên Zîrekiya Destkird:**

Ji bo dûrketina ji kêşeyên ku ji ber bikaranîna nepîşeyî ya zîrekiya destkird derdikevin, îmzekar pabendî van xalan dibin:

1. Bikaranîna teknolojiyên zîrekiya destkird bo hilberandina parvekirinên sexte yan naverokên derew û xapînok qedexe ye.
2. Weşandin yan berhemanîn her materyalekê ku bi zîrekiya destkird hatibe çêkirin û armanca wê rûreşkirin, belavkirina nefretê yan handan be, qedexe ye.
3. Sextekirina kesayetiya mirovan bi rêya guhertina wêne yan dengên wan bi amûrên zîrekiya destkird qedexe ye; nexasim dema ku armanc li dijî xalên vê rêziknameyê be yan bo xapandina raya giştî be.
4. Berhemanîna naverokên rûmetşikên yan seksî ku wêne, vîdyo yan dengên kesên rastîn tê de hatine bikaranîn, qedexe ye.
5. Bikaranîna wêne yan vîdyoyên kesên rastîn di nav naverokeke çêkirî yan sexte de ku li dijî xalên vê rêziknameyê be, qedexe ye.
6. Nabe fîltreyên dîjîtal bi awayekî werin bikaranîn ku rastiyan biguherînin yan bandorê li nasnameya kesan bikin. Di dema bikaranîna fîltreyan bo mebestên hunerî yan teknîkî de, divê

mirov pir baldar be, bi taybetî di dema kişandina dîmenên komên lawaz de.
7. Bikaranîna fîltreyan yan her guhertineke dîjîtal a li ser rûyan di nûçeyan, materyalên dokumenter û her naverokeke ku dibe bibe sedema windakirina bawerî û rastiya dîmenê, qedexe ye.
8. Bikaranîna fîltreyên ciwaniyê li ser rûyê qurbaniyan, berpirsan yan şahidan qedexe ye; ji ber ku ev yek wêneyekw sexte û nerastîn ava dike.

**Parastina Taybetmendî, Dane û Milkiyeta Ramanî:**

Ji bo misogerkirina parastina taybetmendî, dane û milkiyeta ramanî, îmzekar pabendî van xalan dibin:

1. Bikaranîna teknolojiyê bo derxistina daneyên kesane yên her kesekî, bêyî bingeheke yasayî ya zelal yan berjewendiyeke giştî ya rastîn ku vê yekê rewa bike, qedexe ye.
2. Nabe Kopîkirin yan bikaranîna her naverokeke ku bi mafê milkiyeta raman tê parastin bi mebesta berehemsnîna materyalên weşanê were kirin; îmzekar pabendî parastina afirîneriyê û rêzgirtina li mafên nivîskaran dibin.
3. Sazî pabend in ku siyaset û pergalên zelal bo birêvebirina bikaranîna zîrekiya destkird di nav xwe de deynin. Her wiha divê şopandina asta pabendbûna xebatkaran bi van siyasetan re were kirin û amûrên zîrekiya destkird bikevin bin nirxandineke serbixwe, da ku rêzgirtina li prensîpên rêziknameyê were misogerkirin. Sazî dê kanalên taybet bo wergirtina giliyên têkildarî bikaranîna xirab a zîrekiya destkird ava bikin û li gorî rênimayên zelal wan giliyan çareser bikin.

Ev rêzikname îmzekaran han dide ku asta piştbestina xwe ya bi teknolojiyên zîrekiya destkird di karên xwe de aşkere bikin û giringiyê bidin perwerdehiya berdewam, da ku şiyanên xwe yên pîşeyî xurt bikin û bi awayekî berpirsiyarî sûdê ji pêşketina teknolojyayê wergrin.

**Bikaranîna amûrên zîrekiya destkird di çarçoveya deh prensîpan de tê birêvebirin:**

**1. Exlaqê rojnamegeriyê rê nîşanî şêwazê bikaranîna teknolojiyê dide:**

Dezgehên medyayê û rojnamevan teknolojiyên nûjen bikar tînin, da ku şiyana xwe ya gihandina peyama xwe ya bingehîn xurt bikin, ku ew jî mîsogerkirina mafê her kesekî bo gihîştina agahiyên pêbawer û bikalîte ye.

Divê ev armanc bibe bingeha hemû bijardeyên têkildarî bikaranîn û pêşxistina amûrên teknolojîk. Di dema bikaranîna pergalên zîrekiya destkird de, divê nirxên bingehîn ên exlaqê pîşeyî werin parastin; wek: babetyarî, hûrbînî, dadmendî, serbixwebûn, zirarnekirin, cudakarînekirin, berpirsiyartî, rêzgirtina li nepeniyê û parastina nehêniya çavkaniyan.

**2. Dezgehên medyayê pêşîntiyê didin îradeya mirovî:**

Divê biryara mirovî di stratejiyên demdirêj û di bijardeyên edîtoriyê yên rojane de, wekî hêmana sereke bimîne. Bikaranîna pergalên zîrekiya destkird divê encama biryareke mirovî ya hişmend û lêkolînkirî be.

Tîmên edîtoriyê divê armancên bikaranîna her pergala zîrekiya destkird diyar bikin û çarçove û mercên sepandina wê bi zelalî destnîşan bikin. Her wiha divê çavdêriyeke giştî û berdewam li ser bandorên van pergalên bikin, pabendbûna wan bi çarçoveya diyarîkirî re kontrol bikin û her tim şiyana rawestandina wan di her kêliyê de biparêzin.

**3. Pergalên zîrekiya destkird ên di rojnamegeriyê de tên bikaranîn, dikevin bin nirxandineke serbixwe ya pêşwext:**

Pêdivî ye ku pergalên zîrekiya destkird ên ku dezgehên medyayê û rojnamevan xwe dispêrinê, bikevin bin nirxandineke serbixwe, giştî û hûr, ku aliyên piştgirên azadiya çapemeniyê jî tê de beşdar bin.

Divê ev nirxandin pabendbûneke zelal bi nirxên bingehîn ên exlaqê karê rojnamegeriyê nîşan bide. Her wiha divê ev pergal li gorî yasayên nepeniyê, milkiyeta ramanî û parastina daneyan bin.

Divê çarçoveyeke lêpirsînê ya zelal were danîn da ku her kêmasiyek di van daxwazan de were çareserkirin. Çêtir e ew pergal werin pejirandin ku şiyana wan a şirovekirinê bilind e û bi awayekî ku mirov dikare pêşbînî bike û jê fêm bike, dixebitin.

**4. Dezgehên medyayê her tim ji naveroka ku diweşînin berpirsiyar in:**

Dezgehên medyayê di hemû qonaxên komkirin, amadekirin û weşandina agahiyan de (di nav de bikaranîna teknolojiyên zîrekiya destkird jî) xwedî berpirsiyariya tam a edîtoriyê ne. Ji bo her naverokeke ku diweşînin, bêyî ku were nêrîn ka kîjan amûr di berhemanîna wê de hatiye bikaranîn, ew têne lêpirsîn.

Divê berpirsiyariyên girêdayî bikaranîna pergalên zîrekiya destkird bi zelalî werin diyarkirin û radestî xebatkarên peywendîdar werin kirin, da ku pabendbûna berdewam bi exlaqê rojnamegeriyê û prensîbên edîtoriyê yên pejirandî were mîsogerkirin.

**5. Dezgehên medyayê di bikaranîna pergalên zîrekiya destkird de şefafiyetê diparêzin:**

Divê dezgehên medyayê bi awayekî aşkere û zelal her cure bikaranîna zîrekiya destkird a ku bandoreke bingehîn li ser berhemanîn yan

belavkirina naverokê dike, aşkere bikin û hemû wergirên agahiyan (raya giştî) ji vê yekê agahdar bikin.

Her wiha, saziyên medyayî pabend in ku tomareke giştî amade bikin ku tê de pergalên zîrekiya destkird ên niha bi kar tînin yan berê bikar anîne, werin diyarkirin; ligel zelalkirina armanc, çarçove û mercên bikaranîna her pergaleleê.

**6. Dezgehên medyayê reseniya naverokê û şiyana şopandina wê misoger dikin:**

Pêwîst e dezgehên medyayê, heta ku ji destê wan tê, amûr û teknolojiyên pêşkeftî bikar bînin, da ku reseniya naveroka weşandî û çavkaniya wê kontrol bikin. Di heman demê de divê agahiyên pêbawer li ser çavkaniyê pêşkêş bikin û her cure guhertinên ku paşê li ser materyalê hatine kirin, belge bikin.

Her naveroka ku pîvanên resenî û pêbaweriyê pêk neyne, wekî naverokeke gumanbar û xapînok tê hejmartin; lewma berî weşandinê divê di bin kontrolên hûr re derbas bibe.

**7. Rojnamegerî xêzeke zelal di navbera naveroka resen û ya destkird de dikişîne:**

Rojnamevan û dezgehên ragihandinê hewl didin ku di navbera naverokên li ser bingeha wêne û tomarên rastîn (wek wêne, tomarên dengî û vîdyoyan) û naverokên ku bi pergalên zîrekiya destkird hatine berhemanîn an bi awayekî bingehîn hatine sererastkirin de, cudahiyeke zelal û pêbawer misoger bikin. Her tim baştir e ku ji bo nîşandana bûyerên rastîn, dîmen û tomarên resen werin bikaranîn.

Her wiha, divê saziyên medyayî ji her reftareke ku bi rêya teknolojiyên zîrekiya destkird raya giştî dixapîne, dûr bikevin. Nexasim berhemanîn yan bikaranîna naverokên destkird ên ku dişibin tomarên rastîn yan kesayetiya mirovên rastîn teqlîd dikin, qedexe ye.

**9.** Rojnamevan, dezgehên ragihandinê û komên piştgiriya rojnamegeriyê wekî parêzvanên mafê gihîştina agahiyan, di rêveberiya (governance) zîrekiya destkird de beşdar dibin. Rojnamevan, medya û komên piştgiriyê di rêveberiya pergalên zîrekiya destkird de xwedî roleke bingehîn û çalak in. Divê ew di hemû qonaxên çavdêriya saziyî de (li ser asta niştimanî û navdewletî) ku têkildarî birêvebirin û pêşxistina van pergalan in, werin beşdarkirin.

Erkê wan e ku misoger bikin rêveberiya zîrekiya destkird xwe dispêre nirxên niştimanî yên hevpar û di qonaxên dîzaynkirin, pêşxistin û sepandinê de cihêrengiya mirovî û çandî nîşan dide. Her wiha, divê ew geşedanên teknolojîk bişopînin û bandorên zîrekiya destkird bi awayekî babetyane, hûr û bi hişmendiyeke rexneyî ya xurt rapor bikin.

**10. Rojnamegerî bingehên xwe yên exlaqî û aborî di danûstandinên bi rêxistinên zîrekiya destkird re, diparêze:**

Xwediyên pergalên zîrekiya destkird pabend in ku navê çavkaniyan diyar bikin, rêz li mafên milkiyeta ramanî bigirin û dema ku berhemên rojnamegeriyê di rahênankirin yan pêşxistina modelên xwe de bikar tînin, berdêleke dadmendane bidin xwediyên mafan. Divê ev berdêl wekî xelat û mûçeyên adil bigihêje rojnamevanan jî.

Her wiha, xwediyên van pergalan pabend in ku tomareke şefaf û bi hûrgilî amade bikin ku tê de diyar bibe ka kîjan naverokên rojnamegeriyê bo rahênankirina modelên wan hatine bikaranîn; ev yek bawerî û lêpirsînê xurt dike û mafên pîşeyî û aborî yên rojnamevan û saziyan diparêze.

**Aşkerekirina Giştî û Xurtkirina Baweriyê:**

- Saziyên ragihandinê pabend in ku raporên salane biweşînin, ku tê de hewildanên wan ên ji bo têkoşîna li dijî gotinên nefretê û

sînordarkirina bikaranîna xirab a zîrekiya destkird werin nîşandan; ev yek şefafiyetê xurt dike û baweriya xelkê bihêz dike.

- Sazî hewl didin ku bi rêya zelalkirina mîkanîzmayên kar û amûrên teknolojyayê, raya giştî di fêmkirina siyasrt û rêbazên hatine girtin de beşdar bikin, da ku peywendiyeke li ser bingeha zelalî û pêbaweriyê ava bibe.
- Sazî pabend in ku her nûbûn yan guhertineke di siyasetên bikaranîna zîrekiya destkird yan rêzikên têkoşîna li dijî gotinên nefretê de, bilez aşkere bikin û bi awayekî rasterast bigihînin xebatkeran û raya giştî.

**Madeya Heştem: Parastina Nepenî û Daneyan**

Rêzgirtina li nepenî û jiyana taybet, mafekî resen ê her kesî ye û bingeheke sereke ya xebata medyayî ya berpirsiyar e. Saziyên medyayî, rojnamevan, çêkerên naverokê û xebatkarên medyaya civakî pabend in ku di hemû qonaxên komkirin, amadekirin û weşandina agahiyan de, li gorî yasayên niştimanî û pîvanên navdewletî vî mafî biparêzin. Ev parastin li ser van prensîb û mercên jêrîn tê binyatkirin:

**Prensîpên Giştî:**

- Komkirin yan weşandina her cure dane û agahiyên kesane (wekî navnîşan, tomarên tenduristiyê, daneyên darayî yan hûrguliyên jiyana malbatî û rojane) **qedexe ye**; ji xeynî rewşên ku hinceteke pîşeyî ya zelal hebe, xizmeta berjewendiya giştî bike û sûdê wê ji zirara wê zêdetir be. Di van rewşan de jî divê berî weşandinê mezinahiya zirara çaverêkirî bi hûrgilî were kontrolkirin.
- Xebatkarên medyayê pabend in ku agahiyên hesas bêyî destûra aşkere û biagah a xwediyên wan belav nekin; her wiha divê armanca pîşeyî ya weşandin yan daxistina dîmenan ji xwediyên wan re were zelalkirin.

**Rêzikên Wênegirtin û Weşandinê:**

1. **Cihên niştecîhbûnê, kar û saziyên taybet:**
   Kişandin yan weşandina dîmenên kesan di nav malên wan, cihên kar, nexweşxane, dibistan û cihên îbadetê de qedexe ye; tenê bi destûra aşkere û biagah a xwediyên wan dibe.
2. **Cihên girtî:**
   Dema ku di cihekî girtî de zêdetirî 20 kesan (yan li gorî hin pîvanan 50 kesan) hebin, divê ji amadebûyan bi awayekî zelal were pirsîn ka destûr didin dîmen werin girtin yan na; her wiha divê sedema kişandinê û saziya ku dê biweşîne were diyarkirin.
3. **Cihên giştî yên mezin:**
   Di dema kişandina dîmenan li cihên vekirî yan girtî yên ku zêdetirî 50 kesan lê hene de, divê amadebûyî werin agahdarkirin. Piştî amadekirina kelûpelên kişandinê, divê herî kêm 5 xulekan dem bidin xelkê, da ku kesên naxwazin di dîmen de xuya bibin ji wê derê dûr bikevin.
4. **Amûrên veşartî yên deng û dîmenan:**
   Bikaranîna van amûran bi temamî qedexe ye. Tenê di karên lêkolînî de ku berjewendiyeke giştî ya pir mezin tê de hebe û bi rêyên aşkere neyê encamdan, mirov dikare bikar bîne; ev jî bi şertê destûra nivîskî ya sernivîskar dibe.
5. **Bikaranîna neexlaqî ya dîmenan:**
   Divê ji girtin yan weşandina dîmenên bi mebest ên derveyî çarçoveyê (wek kişandina nêzîk a kesan bêyî agahdariya wan, yan kişandina beşên hesas ên laşê wan) were dûrketin.
6. **Qedexebûna henekpêkirin û sivikatiyê:**
   Bikaranîna wêne yan vîdyoyan bi mebesta henekpêkirin, tinazkirina bi şikl û liv û tevgerên kesan qedexe ye; ji xeynî rewşên ku destûra nivîskî hebe û armanc xizmetkirina berjewendiyeke giştî ya rastîn be.
7. **Qedexebûna zirar û rûreşkirinê:**

Weşandin yan dubare-weşandina her wêne û vîdyoyekê ku bibe sedema zirara derûnî, rûreşkirin (navzirandin), xemgînî yan êşê bo xwediyên wan û xizmên wan, qedexe ye.

8. **Naverokên li ser hesabên kesane:**

   Wêne yan vîdyoyên taybet ên ku li ser hesabên kesane yên di torên civakî de hatine parvekirin, nabe bêyî destûra xwediyên wan werin bikaranîn.

9. **Cudahî di navbera qada giştî û ya taybet de:**

   Di dema weşandinê de, divê cudahiyeke zelal di navbera agahiyên ji bo her kesî ne û agahiyên jiyana taybet de, were kirin; divê ji her cure tevliheviya ku zirarê digihîne kesan were dûrketin.

10. **Şefafiyet di komkirina agahiyan de:**

    Divê nasnameya rojnamevan yan tîma kişandinê û armanca wan her tim bi awayekî zelal were diyarkirin. Divê mafê kesan hebe ku neyên kişandin, daxuyaniyê nedin yan destûrê nedin bikaranîna wêneyên xwe.

11. **Aşkerekirina armancên ne-rojnamegerî:**

    Saziyên medyayî pabend in ku her cure armancên siyasî, bazirganî yan ne-rojnamegerî yên girêdayî komkirina daneyan aşkere bikin. Bikaranîna daneyên ku hatine komkirin, li derveyî çarçoveya karê medyayî yê rewa, qedexe ye.

**Hevsengiya di navbera Berjewendiya Giştî û Zirarê de:**

- **Nirxandina zirar û sûdê:** Di rewşên ku berjewendiya giştî weşandina agahiyên taybet ferz dike, divê rojnamevan û saziya medyayî hevsengiyeke hûr di navbera "mafê xelkê yê zanînê" û "mafê kesê yê parastina jiyana taybet" de bikin. Di vir de armanca bingehîn divê kêmkirina zirara li ser kesan be.

**Nepeniya Kesayetên Giştî:**

- Tevî ku mafê nepeniyê yê kesayetên giştî û berpirsan jî heye, lê di van rewşan de ev maf tê rakirin, her wiha, eger agahî mijarên wekî gendelî, bikaranîna xirab a postê yan jî nakokiya berjewendiyan aşkere bikin, parastina taybetmendiyê nayê sepandin.

**Madeya Nehem: Beşdarî, Berpirsiyarî û Lêpirsîn**

**Yekem: Beşdarî**
Îmzekar bang li hemû sazî û xebatkarên qada medyayê dikin ku tevlî vê belgeyê bibin û wê îmze bikin. Ev yek wekî nîşana pabendbûna hevbeş bi pîvanên exlaqî û pîşeyî, û xurtkirina çandeke medyayî ya berpirsiyar e ku rêzê li rûmeta mirovî û mafên kesan digire.

**Duyem: Pabendbûna Giştî**
Her kesê ku vê belgeyê îmze dike, pabend dibe ku rêzê li prensîp û pîvanên tê de bigire û wan bixe nav karê xwe yê pîşeyî yê rojane. Armanc ew e ku peyameke medyayî ya li ser bingeha duristî, bêalîbûn, hûrbînî û xizmeta berjewendiya giştî were xurtkirin.

**Sêyem: Berpirsiyarî û Lêpirsîn**

**1. Berpirsiyariya Hevpar:**

- Xebatkarên ku berhemanîn û weşana naverokan dikin û saziyên medyayî bi xalên vê rêziknameyê pabend dibin.

- Berpirsiyarî di navbera sazî û kesan de bi awayekî pileyî û temamker e; ti kiryareke medyayî ya ku ji encamên naveroka weşandî direve, nayê qebûlkirin.
- Xebatkar û sazî, li gorî qonaxên amadekirina naverokê û li gorî pêgeha kesî yê di heykela îdarî de, di berpirsiyariyê de hevpar in.

**2. Berpirsiyariya Kesan:**
Her kes (rojnamevan, çêkerê naverokê yan xebatkarê medyayê) pabendî van xalan dibe:

- Kontrolkirina çendcarî ya naverokê, çi li ser platformên saziyê çi li ser hesabên kesane û pîşeyî be, da ku li dijî xalên rêziknameyê nebe.
- Divê piştrast bikin ku çalakiyên wan ên taybet wek bi saziyên wan ve girêdayî, xuya nekin.
- Divê tak di derketina xwe ya pêşberî raya giştî de, li gorî pîvanên bilind ên berpirsiyariya pîşeyî û exlaqî tevbigerin.

**3. Berpirsiyariya Saziyê:**
Sazî pabendî van xalan dibin:

- Nîşandana helwesteke tund li hemberî her binpêkirinekê, nexasim binpêkirinên bingehîn, çi li ser platformên saziyê çi yên kesane bin.
- Avakirina ziyasetên zelal û aşkere ji bo danûstandina bi binpêkirinên vê rêziknameyê re.
- Ji ber ku bandora her binpêkirinekê ne wekî hev e, divê ceza li gorî bandora neyênî bin.
- Girtina rênimayên rasterast û bilez bo hin binpêkirinên ku paşxistin û lêkolîneke dirêj qebûl nakin (wek dijûn, sivikayî û hwd.).

- Amadekirina rêyeke aşkere bo raya giştî û aliyên peywendîdar, da ku bikaribin naverokan kontrol bikin û gilî li ser her naverokeke gumanbar bikin.
- Bersivdayîna giliyan.
- Pêkanîna hemû rêbazên mîna (rastkirin, sererastkirin, guhertin, aşkerekirina şaşiyê, lêborîn, qerebûkirin, berhemanîna naverokeke nû) bo vegerandina mafê kesên ku zirar dîtine.
- Weşandina raporên demkî ku tê de cewherê giliyan û şêwazê çareserkirina wan tê diyarkirin.
- Perwerdekirina xebatkaran li ser têkoşîna pîşeyî û exlaqî ya li dijî gotarên nefretê; her wiha parastina rojnamevanan û dabînkirina jîngeheke kar a ewle û giştgir.
- Pejirandina siyasetên îdarî yên zelal ku xebatkaran ji her cure cudakarî, handan yan zordestiyê diparêze.
- Dabînkirina xeteke giliyan a hundirîn û serbixwe.
- Amadekirina rêzikên nivîskî bo birêvebirina şiroveyan.
- Nûkirina siyasetên îdarî, edîtorî û nivîskî bi awayekî dewrî, da ku li gorî guherînên pîşeyî, teknolojîk û civakî bin.
- Birêkxistina danûstandina bi daneyên kesane û materyalên hesas re, bi rêya rênimayên taybet.
- Amadekirina siyasetên îdarî bo rêgirtin li bikaranîna daneyan bêyî bingeheke yasayî yan pîşeyî.
- Şopandina naverokên ku bi zîrekiya destkird hatine berhemanîn û danîna siyasetên têkildarî vê mijarê.

**4. Berpirsiyariya li Hemberî Civakê:**

- Pêşxistina berjewendiya giştî û parastina nirxên mirovî.
- Giringîpêdana bi ser geşepêdan, aştî, dadmendî û parastina mafan.

- Xurtkirina aştiya civakî û pêkvejiyanê.
- Beşdarbûna di bilindkirina hişmendiya erênî û têkoşîna li dijî nefretê de.
- Ronîkirina mijarên geşepêdana civakî (perwerde, tenduristî, jîngeh, têkoşîna li dijî hejariyê).
- Parastina nirxên hevwelatîbûnê, nasnameya niştimanî û rêzgirtina li nasnameyên din.
- Rêgirtin li weşandina her tiştê ku tirsê yan tevliheviyê belav dike.
- Zêdekirina naverokan di demên qeyranan de ber bi çareserî, aramkirin û rênîşandanê ve.

**5. Lêpirsîn li Pêşberî Raya Giştî:**

- Lêpirsîn bi azadiya çapemeniyê, berpirsiyariya li hemberî civakê û rêzikên pîşeyî-exlaqî ve girêdayî ye.
- Peymanên navdewletî tekez dikin ku azadiya ragihandinê ji mîkanîzmayên lêpirsîn û şefafiyetê nayê veqetandin.
- Rastkirina şaşiyan bi her awayê gengaz, mafê raya giştî ye.
- Rêxistinên civaka sivîl rola lêpirsînê û pêşxistina amûrên çavdêriyê digirin ser xwe.
- Dabînkirina amûrên gilîkirinê, avakirina sîstemên çavdêriya hundirîn û siyasetên ku mafê raya giştî yê lêpirsînê diçespînin.
- Îmzekar pabendî hevkariya bi encûmen û desteyên ku çavdêriya cîbicîkirina vê rêziknameyê dikin, dibin.
- Ji mafê raya giştî ye ku xeta edîtorî, siyasetên weşanê û çavkaniyên dahatê zanibe. Pêdivî ye ku hebûna van siyasetên weşandî (yên li jêr) were mîsogerkirin:
    - Mîkanîzmaya hilbijartina mijaran.
    - Danûstandina bi çavkaniyan re.
    - Siyasetên weşanê.

- Rêbazên çareserkirina giliyan.
- Mîkanîzmayên sererastkirinê.
- Pêşîne û arasteyên giştî yên saziyê.

**Madeya Dehem (Dawî):**

Komîteyeke taybet tê avakirin; erkê wê çavdêrîkirina sepandina pîvanên vê rêziknameyê, danîna mîkanîzmayên şopandin, perwerde û nirxandinê, wergirtina giliyan, derxistina raspardeyan û weşandina raporên demkî ye.

Komîte bi erkê nirxandina pêdiviyan û şêwirîna bi îmzekeran re radibe, da ku rêziknameyê nû bike û guhartinan ji bo raya giştî aşkere bike.

**Çavkaniyên Rêziknameyê:**

- Gotûbêj û pêşniyarên komxebatên amadekirina rêziknameya reftarê ya sektora medyayê li Sûriyeyê, bi beşdariya pispor û rojnamevanan.
- Daxuyaniya Destûrî ya Komara Erebî ya Sûriyeyê.
- Belenameya Rûmetê ya Rojnamevanên Sûriyeyê.
- Rûbirbûna li dijî gotarên nefretê di înternetê de (UNESCO).
- Romalkirina gotarên nefretê: Rênima bo rojnamevanan (UNESCO).
- Plana Çalakiyê ya Rabatê (Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan).
- Yekîtiya Navdewletî ya Rojnamevanên Pîşeyî (SPJ).
- Stratejî û Plana Çalakiyê ya Neteweyên Yekgirtî derbarê gotara nefretê.
- Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî (NY).

- Peymana Neteweyên Yekgirtî – Madeya 2.
- Peymana CEDAW (Ji bo rakirina her cure cudakariya li dijî jinan).
- ILO – Peymana C190 (Rêxistina Kar a Navdewletî).
- Rênimayên bo rojnamevanên ku nûçeyan li ser zarokan amade dikin (UNICEF).
- Peymana Mafên Kesên Kêmendam (Neteweyên Yekgirtî).
- Bêalîbûn di rojnamegeriyê de (Tora Rojnamevanên).
- Reftara ku handana kîndar dide (Hate Speech Policy / Meta).
- Rênimayên Medyaya Civakî (Zanîngeha Arizona).
- Pêşniyara derbarê Exlaqê Zîrekiya Destkird (UNESCO).
- Peymana Parîsê ya li ser Zîrekiya Destkird û Rojnamegeriyê (RSF).
- Rênimayên edîtorî bo bikaranîna zîrekiya destkird (Yekîtiya Rojnamevanên Tirkiyeyê).